# Ronahî

Şopdara Rastiyê ye

Rojnameya siyasî, civakî û çandî  Jimar :1336  24-Berfanbar-2025  www.ronahi.net/ku/



Navnîşan

www.ronahi.net/ku/  rojnameyaronahi  @ronahikurdi55

nameronahi@gmail.com  Rojnameya Ronahî  +963 984 370 218


# Bi tiliyên jinan çîrok tên hûnandin

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

**Di firoşgeheke biçûk a hunerên destan de ku huner bi debara jiyanê re têkil dibe, jinên Qamişlo çîrokên xwe bi tiliyên xwe diafirînin. Meryem Osman jî bi rêya projeya xwe tekez dike ku karê destan ne tenê huner an pîşeyeke, lê belê rêyek e ku jinan bihêz dike.**

Li kolaneke bajarê Qamişlo, li beramberî Nexweşxaneya Ferman, firoşgeheke biçûk heye ku rûyê wê bi morîk û tayên hevrêşmî yên rengîn xemilandî ye û di hundirê wê de berhemên hunerî belav bûne. Li vir, ne tenê meseleya bazirganî an kirîn û firotinê ye, lê çîrokeke dirêj e ku bi destên sebirê hatiye hunandin.



### Çîroka hunera destan

Meryem Osman jineke 37 salî ye, di nav rengan de rûniştiye mîna ku ew beşek ji wan be. Bi kenek aram, ew dibêje: "Min xwendina xwe ya zanîngehê temam nekir, lê min jiyan xwend û ez jê fêr bûm ka mirov çawa bi destên xwe diafirîne û çawa ji tiştek biçûk bedewiyek mezin çêdike."

Ji zarokatiya xwe ve, Meryem ji wênesaziyê, hunerên destan û xemilandinê hez dikir. Wê xwendina xwe ya dibistanê temam nekir, lê rêyeke din hilbijart, rêya hunerên jinan. Ev destpêka rêwîtiya ku wê bir peymangeheke hunerên destan li Şamê bû, ku wê du salên tijî li wir xwend.

Wê got: "Li Şamê, min çavên xwe li cîhaneke mezin vekirin, cîhaneke ji rengan, mûrikan, têlan û her tiştê ku destê mirov dikare çêbike ger ji xebatê hez bike."

Piştî vegera xwe bo Qamişloyê, Meryem deh salan wek mamosteya hunerê xebitî, paşê biryar da ku qonaxek nû di jiyana xwe de dest pê bike. Yek ji hevkarên wê yên di dema zanîngehê de dikaneke hunerên destan vekiribû û wê teşwîq kiribû ku beşdar bibe. Bi vî awayî, ji bo Meryem fikir çêbû ku li malê bixebite û nakiş û xemilandinên bi morîk çêbike, dû re wan li vê dikanê bifroşe. Lê çîrok bi Meryemê nesekinî, dikana ku bi biçûk dest pê kir, niha bûye navendek ku jinên ji deverên cûda tîne cem hev. Meryem destnîşan kir: "Em li vir ne tenê firoşkar in, lê xwişk in, her yek piştgiriyê dide hev û em hemî ji bo jiyana bi hev re bedewiyê diafirînin."



Madeyên hewce ji Îran, Iraq û Tirkiyeyê tên û carinan jî ji Şam û hundirê Sûriyeyê tên, ji ber ku gelek ji wan li Qamişlo peyda nabin. Ev zehmetiyên lojîstîkî her gav beşek ji dijwariyê bûne, wekî ku Meryemê rave kir: "Carinan em diçin bazarê da ku li cureyek diyarkirî ya morîk an têlan bigerin û em dibînin ku mîqdar xilas bûye, ji ber vê yekê em bi hefteyan li bendê ne ku materyalên nû werin, lê ev yek me narawestîne. Em heta ji kêmasiyê tiştek nû çêdikin."

Jinên di hundirê dikanê de gelek parçeyên mîratî yên li derveyî welêt hatine çêkirin difiroşin, jinên ji derveyî Sûriyeyê beşdarî çêkirina hunerên destan dibin, ji ber vê yekê hûn parçeyên ji Îranê yên bi destên jinan hatine çêkirin û yên din jî ji Bakurê Kurdistanê dibînin.

### Her berhemek şopek kesan e û çîrokekê hildigire

Di hundirê dikanê de, perçe ji sade bigire heya tevlihev hene. Hin dikarin di tenê du saetan de werin qedandin, hinên din jî hefteyek tevahî xebata domdar hewce dikin. Biha ji 25,000 heta 250,000 lîreyên Sûrî ne. Dikan bi rihê xebata tîmê û piştgiriya hevbeş hate damezrandin, ku ji hêla komek jinan ve tê rêvebirin ku deriyên xwe ji jinên din ên ku bi hunerên destan re eleqedar dibin re vedikin, her çend ew ji malên xwe bixebitin jî.

Dema ku hûn di nav refikên dikanê de digerin, hûn ku her berhemek şopek kesane û çîrokek biçûk hildigire. Her berhemek li vir tiştek ji kesayetiya çêkerê xwe û dibe ku ji fikar û kêfxweşiyên wê jî hildigire.

Tevî zehmetiyên ji ber kêmbûna madeyên hewce, herwiha bihayên bilind û tengbûna bazara herêmî, ev proje bi saya biryardariyê berdewam dike. Her jinek ku li vî cihî dixebite dizane ku karê wê ne refahiyete, lê çavkaniya debara jiyana wê û malbata wê ye. Bi demê re, dikan ne tenê cihekî kirîn û firotinê bû, lê di heman demê de cihekî ji bo hevdîtin, danûstandina tecrubeyan di navbera jinan de bû, ku gelek ji wan bêyî tecrubeyê an amûran dest pê kirine û li vir fêr dibin ka mirov çawa bi destên xwe tiştek çêdike.

## FERHENGA BIWÊJAN

**Dizî ji kelehan jî dibin:**
- Mirov çiqas tiştekî biparêze jî ji sedî sed demana wê nîne; çiqas tişt parastî bin jî ileh kêmayiyek di deverekê de tê dîtin; di vê dinyayê de tişkeke misoger nîne.

**Dono don dixwe, Sondo ber de sond dixwe:**
-Yek xirabiyê dike, yê din wî diparêze.

**Guhê xwe dayê:**
- Hay jê ma; nehişt tiştek pê were; parast.

**Ket bin çengê wî:**
- Xwe pê dide parastin.

**Ma tira reş kiriye:**
- Ma sûcê wî çi ye?

**Ne ji pişt xaniyan hatiye:**
- Ne bêxwedî ye.

**Siya min li serê ye:**
- Ez wî diparêzim.

**Xist bin perê xwe:**
- Parast.

**LI SER JIBÎRKIRINÊ**

**Bênanûxwê ye:**
- Kesê ku hevalê xwe, dostê xwe ji bîr dike ji bo wî tê gotin.
Biavêjin tûrikê Mele Ebdulbarî:
- Dema yek diaxive lê di nava axaftinê de mijara xwe ji bîr dike diçe ser mijareke din, hingê dibêje.

**Çav ji çavan biriyan dibe şubhê miriyan:**
- Dema mirov ji nas û dostên xwe dûr dikeve mirov dibe weke miriyan.
- Dema mirov demeke dirêj hev nebîne mirov hev ji bîr dike.

**Dema mitirb birçî dibin, dahol û zirne tê bîr wan:**
- Dema pêwîstiya yekî çêdibe nû yê alîkariyê bidiyê tê bîrê.

**Dûrî çavan, dûrî dilan:**
- Dema demeke dirêj mirov hev nebîne mirov he ji bîr dike.

**Emelê pîrê nayê bîrê:**
- Ji bo kesên kêmayiyên xwe ji bîr dikin tê gotin.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Bi kamîreya Ayşa Silêman



## Parêzvanên mafên jinan dibin gefê zihniyeta zayendperestiyê de ne

Parêzvanên mafê mirovan yên jin bûne yek ji hedefên zihniyeta zayendperest û baviksalarî. Di asta navnetewî de jinên ku dibin dengê jinan û parastina mafên wan dikin, rastî tundî û gefan tên.**R-2**



## Xebatên salekê yên Însiyatîfa Azadiya Rêber Abdullah Ocalan a Sûriyê

Însiyatîfa Azadiya Rêber Abdullah Ocalan a Sûriyê di nava sala 2025'an de, ji bo azadiya Rêber Apo, piştgiriya banga Aştî û Civaka Demokratîk li ser asta Sûriyê û derveyî wê bi dehan çalakiyên cihreng lidar xistin. Em ê di vê raporê de kar û xebatên insyatîfê yê sala 2025'an û pilansaziya 2026'an ji were eşkere bikin.**R-3**


# Ronahî

Şopdara Rastiyê ye

Rojnameya siyasî, civakî û çandî  Jimar : 1336  24-Berfanbar-2025  www.ronahi.net/ku/  Nirx: 500 L.S


## Xebatên Heyva Sor A Kurd ên 2025'an

Heyva Sor A Kurd di sala 2025'an de ji bo destekdayîna mirovî li seranserî Sûriyê kar û xebateke bêhema da meşandin, bi taybet piştî komkujiyên li Berava Sûriyê û Siwêdayê, Heyva Sor A Kurd bi awayekî lezgîn alîkariyên mirovî pêşkêş kir û bi erka xwe ya mirovî rabû.**R-7**

# ÊRIŞÊN LI SER ŞÊXMEQSÛD Û EŞREFIYÊ RÛYÊ HIKUMETA VEGUHÊZ EŞKERE KIR

Di 22'ê Kanûnê de bi serdana şandeya Tirkiyê ji Şamê re, komên çekdar ên girêdayê hikumeta veguhêz a Sûriyê bi ayawekî pilankirî bi tang û topan êrişî taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Helebê kirin. Di encamê de yek şehîd û 19 birîndar çêbûn. Li hemberî êrişan jî gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê daketin qadan û piştgiriya xwe ji berxwedana Şêxmeqsûd û Eşrefiyê re nîşan dan. Êrişa dawî ya li ser Şêxmeqsûd û Eşrefiyê rûyê hikumta veguhêz ê rastîn eşkere dike, herwiha desteserkirina îradeya hikumeta veguhêz ji aliyê Tirkiyê ve radixe ber çavan.**R-5**






## Ji çiraxên wêjeya Kurdî

Helbestvan Narîn Omer çavkaniyeke ji tîpên bedew û buxçeyek ji wateyên pîroz e ku îro di bilindahiya dayîn û afirîneriya xwe de ye.**R-9**

## Çandiniya kartolan li Sûriyê

Berhema kartolan di nava berhemên çandiniyê yên herî girîng di Sûriyê de ye, çandina wan li piraniya herêman berbelave ku ji bo cotkar û bazarên herêmî çavkaniyek girîng a xwarin û aboriyê ye.**R-8**



## 'Hikumeta veguhêz xwe neguherîne, wê ceza dîsa werin ferzkirin'

Endamê NRLS'ê Ehmed Sîno da zanîn ku ger hikumeta veguhêz di terzê xwe de neyê guhertin, wê cezayên Qeyser dîsa werin ferzkirin û got, "Desthilata Sûriyê ya nû wê di bin çavdêriya navdewletî de be, pêwîst e peymana 10'ê Adarê pêk bîne û kiryaran li dijî gelên Sûriyê rawestîne." **R-6**



## "Kes nebê Kurd dimirin Kurd jîn dibin, jîn dibin qet nakavê ala Kurdan"

Her welat û netewek xwedî sirûdeke neteweyî ye, gelê Kurd jî xwedî sirûda netewî ya bi navê 'Ey Reqîb' e. Piştî bi dehan sal ji zordarî û bindestiyê, gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê piştî Şoreşa 19'ê Tîrmehê bi serfirazî sirûda xwe ya netewî dibêje.**R-10**


**Hikumeta veguhêz a Şamê êrişî jinê dike** — Nehîr pale R-2

**Şer an Biratî?** — Zekî Bedran R-4



**Tovên Yekîtiya Gelan** — Farûk Sakik R-4

**Lîstika Desthilatdariyê ya Li Şamê û Berxwedana Gel** — Erdogan Altan R-5



**Riwê reş bi derewan spî nabe!** — Dilyar Cizîrî R-6

# Parêzvanên mafên jinan dibin gefê zihniyeta zayendperestiyê de ne

Parêzvanên mafê mirovan yên  jin bûne yek ji hedefên zihniyeta zayendperest û baviksalar. Di asta navnetewî de jinên ku dibin dengê jinan û parastina mafên wan dikin, rastî tundî û gefan tên.

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

Rapora 2025'an ya rêxistina civaka sivîl CIVICUS'ê raghand ku azadiya sivîla navnetewî teng bûye û parêzvanên mafên mirovan ên jinan (WHRD) bûne yek ji hedefên sereke yên zext û tundiyê. Li gorî raporê, beşeke girîng a nifûsa cîhanê li wan welatan e ku mafê azadiya fikrî, rêxistinî, kombûna aştiyane bi rêk û pêk lê têne binpêkirin.

**Li 83'ê welatan mafê azadiyê sivîlan tê astengkirin**

Di rapora 2025'an a CIVICUS'ê de hate ragihandin ku li 83'ê welatan mirov ji azadiya sivîl a bingehîn bêpar hatine hiştin. Ev hejmar di sala 2020'an de 67 welat bûn. Li gorî raporê ji sedî 13'ê nifûsa cîhanê di sala 2020'an de li wan welatan diman ku azadiya sivîl di asteke girîng de dihate parastin. Ev rêje îro daketiye ji sedî 7'an. Di nava binpêkirinên mafên mirovan de yên sala 2025'an hatin bi belgekirin, binçavkirina kêfî ya parêzvanên mafên mirovan, rojnamevan û çalakgerên şermezarkirinê hebûn. Herî zêde jî parêzvanên mafên jinan bûn hedef.

**Parêzvanên mafên jinan bi taybet tên hedef girtin**

Di raporê de hate ragihandin ku parêzvanên mafên mirovan ên jinan ne tenê ji ber karê xwe herwiha ji ber nasnameya xwe ya zayendî ya civakî li cihêkariyê û rastî êrîşan tên. Tê gotin, di serî de rojnamevanên jin gelek aktîvîstên jin li ser înternetê bûn hedefa kampanyayên gefxwarin, destdirejî û têkbirina fotoyan. Hate ragihandin ku pêwendiya vê yekê bi bilindbûna populîzm, olperestî û rêveberiyên otorîter re heye.
Di rapora CIVICUS'ê de hate destnîşankirin ku torên li dijî karên edaleta zayendiya civakî û mafên jinan xurtir bûne. Ev torên ku ji aliyê siyasetmedarên popîlîst û komên olî yên fûndamentalîst ve têne birêvebirin, mafên jinan weke gefek li ser nirxên kevneşop û ewlehiya neteweyî, zarok û malbatan dibînin û kampanyayên dezenformasyonê dimeşînin.
Di raporê de binpêkirinên giran ên ku parêzvanên mafên mirovan ên jin lê rast tên, têne belgekirin. Di raporê de hate ragihandin




ku li Îranê Paxşan Azîzî, Şerîfe Mihemadî û Werîşe Mûradî bi cezayê darvekirinê re rû bi rû ne, Xwediya Xelata Aştiyê ya Nobelê Nêrgiz Mihemedî jî gelek caran hate girtin. Hate ragihandin ku li Hong Kong, Belarus, Meksika û Misrê gelek aktîvîstên jin bi kêfî hatin girtin.

**Bi rêya medya dîjîtal tundiyê li ser jinê dikin**

Li herêmekê ku modernîzasyon û avahiyên kevneşopî li hev dikevin, tundiya dîjîtal, nemaze li dijî jinên ku mafên mirovan diparêzin, êdî tenê bûyerek nîne. Berovajî wê, bûye qadeke ku teknolojî wek amûrek ji bo bêdengkirin, biçûkxistin û bêrûmetkirinê tê bikaranîn.
Her çiqas veguherîna dîjîtal li welatên din ên Bakurê Afrîkayê û Rojhilata Navîn bi lez pêşve diçe jî, ev guhertin ji hêla rêziknameyên zagonî yên têr an mekanîzmayên parastinê ve nayê destekkirin da ku ewlehiya jinan di hawîrdora dîjîtal de mîsoger bike. Platformên medyaya dîjîtal ku divê bibin cihên ku jin dikarin dengê xwe bi azadî bidin bihîstin, niha bûne şûrek dudevî. Dema ku jin ramanên xwe diyar dikin, ew gelek caran bi amûrên wekî ol, kevneşopî û heta siyasetê têne bêdengkirin.

**Dixwazin mafê jinê binpêbikin**

Li Îtalyayê, parêzvana mafên mirovan a Mexribî Tria Bouksibi tenê ji ber ku piştgirî da du jinên koçber ên Mexribî yên ku rastî tundiya navmalî hatibûn, rastî kampanyayeke reşkirinê ya dîjîtal a tund hat. Hevgirtina wê veguheriye êrîşên rêxistinkirî li ser jiyana wê ya taybet û malbata wê. Piştgiriya qurbaniyan divê nebe sedemek ji bo lînçkirinê. Lê ew bi pratîkî li ber çavên xelkê hatin darvekirin. Êrîş bi rexneyan neman, lê bi gef, heqaret û destwerdana di jiyana wê ya taybet de berdewam kirin. Vê rewşê bi zelalî nîşan da ku baviksalarî di hawîrdora dîjîtal de çiqas xeternak bûye.

**Jinên ku bihêz dibin tên cezakirin**

Pir girîng bû ku mirov nîşan bide ku jinên Mexribî, nemaze yên ku li derveyî welêt dijîn, ne hedefên hêsanin û qanûn jî wan diparêze. Gelek jinên mîna Tria tenê ji ber parastina mafên jinan rastî êrîşên bi vî rengî tên. Di civakan de, ji jinan tê hêviya bihêzbûnê tê kirin, lê gava ew bihêz bin, tên cezakirin. Serkeftina jinê hin kesan aciz dike, ji ber vê yekê ew serî li çekê û gumanê didin.

**'Beden û nasnameyên jinan dibin amûrên êrîşê**

Ev tundiya dîjîtal li dijî parêzvanên mafên mirovan ên jin zêde dibe. Ev êrîş ne tenê ramanan hedef digirin, lê belê di heman demê de jiyana taybet, navûdengê pîşeyî, dayîktî û jinbûnê jî hedef digirin. Tundiya dîjîtal bi taybetî ji bo parêzvanên mafên jinan wêranker e. Ev êrîş carinan dibin amûrek ji bo tolhildana kesane an hesabpirsîna siyasî, zirarê didin rûmet û jêhatîbûnên wan ên pîşeyî. Nayê qebûlkirin ku jinên şervan di civakekê îdîa dike ku mafên mirovan diparêze de werin şermezarkirin. Tundiya dîjîtal cihê jinan di qada giştî de wenda dike û pêşî li pêşveçûna têkoşîna ji bo wekheviyê digre. Parêzvanên mafên jinan ji ber stereotîpên baviksalar ên kûr rastî zordestiya du alî tên. Laş û nasnameya jinê vediguhere amûrek êrîşê.

**Jin çawa dikarin ji tundiya dîjîtal werin parastin?**

Di têkoşîna li dijî tundiya dîjîtal de nêzîkatiyek piralî girîng e. Divê ev şer ne tenê bi rêziknameyên zagonî, di heman demê de bi polîtîkayên giştî yên ku bi hesasiyeta zayendî di warên wekî perwerde, medya û tenduristiyê de hatine teşekirin jî were destekkirin. Divê heqaretên dîjîtal, nemaze ger ku jin û parêzvanên mafan hedef digirin, bi tundî werin cezakirin. Lê pirsgirêk ne tenê li ser qanûnan e. Guhertinên li ser bingeha wekheviyê di polîtîkayên perwerde, medya û tenduristiyê de ji bo veguherînek rastîn a civakî pêwîst in.

**'Hebûna parêzvanên jin a di qada giştî de jî didize'**

Ger em dixwazin civatek ava bikin ku mafên mirovan diparêze, divê em feraseta ku jinan biçûk dibîne û jinên ku têdikoşin bêrûmet dike jî, biguherînin. Tundiya dîjîtal ne tenê baweriyê dikuje, lê ew hebûna parêzvanên jin a di qada giştî de jî didize. Di encamê de, têkoşîna ji bo wekheviyê paşve diçe û guhertin divê xebata hevbeş a gel be.

**Ji Pênûsa Jin**

## Hikumeta veguhêz a Şamê êrişî jinê dike

**Nehîr Pale**

Hikumeta veguhêz a Şamê ne tenê bi şerîeta Islamê êrişê jinê dike, ji destpêka hukmê paytexta Sûriyê Şam ketiye destê wan de qanûnî êrişî jinê dikin. Ji xwe wan pişta xwe li civaka zayendperest germ kirine ku nefesê nadin jinê û civak amadeye ku zagonên wan ên li ser jinê tê nivîsandin, pêk bîn in.
Roja 8`ê Kanûnê sala 2024`an ew ketin hinek bajarên Sûriyê. Kolan bi kolan destpêkirin zext li jinê kirin. Guneh, heram, sûc, cehenem, eyb bi van têgehan xelekên ji agir li derdora jinê vêxistin û dixwazin nêçîra jinên li gorî wan gunehbarin, bikin. Tişta dûrî exlaq ew e ku jinê bi destê jinan işeknce û ceza dikin. Ji ber vê yekê çekdarên Hikûmeta veguhêz a Şamê çeteyên DAIŞ tînin bîra hemû jinên Sûriyê. Di şikil, rê û rêbazên xwe yên li ser jinê tu cûdahiya wan ji DAIŞ`ê nayê dîtin. Bi taybet kesên navê wezareta dadê li xwe kirine herî zêde têkildarî jinê zagonan diguherîn in.
Hikumeta veguhêz a Şamê ev bûye salek û 16 roj hatiye lê belê hîna jî li xwe mûkir nehatiye û negotiye ku li Sûriyê pirsgirêka cinsiyetparêzî û jinê heye. Li ser zîhniyeta mêr ku difikirin jin kême, mexlûqeke zeyîfe, nikare berpirsyartî rabike û tenê ji bo xizmeta mêr bike tê dinê, dimeşin. Di siyasetê, rêvebirine, têkoşîna leşkerî û bîrdozî cî nadin jinê û tenê mutfexê weke mekan ji bo jinê guncav dibîn in.
Roja 17`ê Kanûnê sala 2025`an wezareta dadê ya Hikûmeta veguhêz raghandin ku li gorî qanûna 17`an mêr berpirsyartiya zarokan radike û jin bi temamî ji xwedîkirina zarokên xwe mehrûm e. Mêr û xwediyên wî yên nêz û dûr ji wan re derdikeve ku zarokan xwedî bikin lê bele zarok ji dayîkê re dernakev in. Di rêbazê nivîsandina zagonê de diyar dikir ku ew çawa li jinê dinêr in. Bi temamî hebûna jinê înkar dikin û êrişa wan li ser jinê îdeolojîk e. Eger jin ciyê xwe di siyasetê de bigre yan jî hewl bide xwe birêxistin bike û hebûna xwe diyar bike wê ji bo wan pirsgirêk be. Ji bo jin tênekoşe wê ji hemû aliyan ve êrişî jinê bikin û li pêşiya wê bibin asteng. Ji ber vê yekê jinan direvînin, li ser wan ferz dikin ku cilên reş li xwe bikin û ji malê dernekevin. Çekdarên hikumeta veguhêz di bin navê ol, adet û teqalîdan de wê êrişî jinê bikin û zagonên ku tevgera jinê pûç bike, derbixîn in. Hebûna jinê weke guneh dibînin û eger ji destê wan were wê hemû rêbazên kevnar ên cezakirina jinan bidin bikar anîn. Jinan di bin navê zîna de recim bikin, bişewtînin û bukjin. Ev Hikûmet ne dûre ku rêbazên herî qirêj ê kuştina jinan bikar bîn in. Li Beravê destdirêjî gelek jinên elewî kirin, revandin, bi darê zorê cilên reş li wan kirin û li xwe muhir kirin. Heyanî ji destê van çekdaran were wê pêlî rûmeta jinê bikin û biperçiqîn in. Ji nêzîkatiyên wan ji jinê re diyar dibe ku ew DAIŞ bi xwe ne û wê hewl bidin di bin navê ol û şerîeta Islamî de dawî li hebûna jinê bîn in.



# DAIŞ-Xurasan zarokan li ser îdeolojiya tundrew perwerde dike

Raporeke Neteweyên Yekbûyî diyar kir ku DAIŞ - Xurasanê nêzîkî 2 hezar çekdarên xwe li Efxanistanê dihêle, zarokên di bin temenê 14 salî de perwerde dikin û bi êrişên terorîstî yên berdewam dibe gef li ser ewlehiya herêmê.

**Navenda Nûçeyan**

DAIŞ-Xurasan (ISK), şaxê sereke ya rêxistinê li Başûrê Asyayê ye, bi hêza texmînkirî ya di navbera 4000 û 6000 çekdar û malbatên wan de, wekî yek ji komên cîhadîst ên herî êrişkar û çalak li ser asta cîhanê derketiye holê. Wê operasyonên xwe li derveyî Efxanistanê berfireh kiriye, çekdaran ji welatên Asyaya Navîn ên wekî Tacîkistan û Ozbekistanê di nav xwe de digire û şiyaneke giring li ser pêkanîna çalakiyên terorîst ên navneteweyî û êrîşên mezin; nîşan daye.
Tîma Çavdêriya Piştgiriya Analîtîk û Cezayan a Konseya Ewlehiyê ya Neteweyên Yekbûyî di destpêka 2025'an de ew şaxekî girêdayî DAIŞ'ê destnîşan kir ku li derveyî herêmê mezintirîn gefa terorîstî ye.
Li gorî raporeke Neteweyên Yekbûyî hat diyar kirin ku rêxistina DAIŞ-Xurasan, derdora 2000 çekdaran li Efxanistanê dihêle û perwerdeyên îdyolojî dide zarokên di bin 14 salan de, ku bi operasyonên terorîst ewlehiya herêmê dixe metirsiyê de.
Konseya Ewlehiyê ya Neteweyên Yekbûyî, di rapora xwe ya dawî ya li ser Efxanistanê de, hejmara giştî ya çekdarên şaxê DAIŞ'ê li parêzgeha Xurasanê dora 2000'an texmîn kir.

**Armanca rêxistinê pêkanîna êrişan li ser asta cîhanî ye**

Di raporê de hat diyarkirin ku serkirdeyên rêxistinê hîn jî di destê welatiyên Efxanî yên ji Peştûn de ye, lê beşek mezin ji çeteyên wê welatiyên Asyaya Navîn in.
Raporê destnîşan kir ku armanca sereke ya DAIŞ-Xurasanê ew e ku li seranserî cîhanê êrişên mezin pêk bîne û şiyana xwe ya peydakirina çeteyên nû û kişandina fînansmanê nîşan bide.

**Zêdetirî 20 rêxistinên terorîst li Efxanistanê çalak in**



Li gorî raporê û li gorî agahiyên ku ji aliyê welatên endam ên Konseya Ewlekariyê ve hatine dayîn, çend kom li Efxanistanê çalak in, di nav wan de DAIŞ-Xurasan, Tevgera Talîbana Pakistanî, El Qaîde, Tevgera Îslamî ya Tirkistana Rojhilat, Koma Ensarullah û Yekîtiya Mucahîdên Pakistanî û komên din hene.
Neteweyên Yekbûyî ragihand ku zêdetirî 20 rêxistinên terorîst ên navneteweyî û herêmî niha li Efxanistanê çalak in.
Komîteya çavdêriya cezayan a girêdayî Neteweyên Yekbûyî diyar kir ku gelek welat bi berdewamî çalakiyên berdewam ên komên terorîst di nav welêt de piştrast dikin.
Raporê zelal kir ku Talîbana Pakistanî gelek êriş ji axa Efxanistanê li dijî Pakistanê pêk anîne.

**DAIŞ-Xurasan zarokan li ser îdeolojiya tundrew perwerde dike**

Di mijareke têkildar de, diyar kir ku DAIŞ-Xurasan li hin deverên Efxanistanê dibistanan ava dike da ku zarokan bi taybetî yên di bin 14 salî de, di operasyonên xwekujiyê de perwerde bikin û wan bi îdeolojiya tundrew perwerde bikin. Konseya Ewlekariyê vê pêşketinê wekî "xeternak" bi nav kir.
Li gorî rapora Neteweyên Yekbûyî, DAIŞ-Xurasan dibistanên olî li bakurê Efxanistanê û deverên nêzîkî sînorê Pakistanê bikar tîne da ku bandorê li zarokan bike û perwerdeyên taybetî ji bo perwerdekirina zarokên temenbiçûk ji bo pêkanîna êrişên xwekujî ava kiriye.

# Li Nîjerê êrişên terorîstî berdewam dikin

**Navenda Nûçeyan**

**Ev demeke di navbera dewleta Nîjer û komên terorîst de şer derketiye, di heman demê de dewletê jî li hemberî terorîstan dest bi oprasyonên leşkerî kiriye.**

Di demekê de dewleta Nîcer ji ber terorîzmê, sûcên revandin û tundiyê têkildarî pevçûnên herêmî bi pirsgirêkên ewlehiyê yên tevlihev re rû bi rû ye, operasyon li dijî komên terorîst û torên sûcdar ji aliyê dewleta Nîcer ve hatine destpêkirin. Gelek kes ji aliyê komên terorîst ve hatine revandin û heta niha çarenûsa wan ne diyar re.
Li gorî çavkaniyên leşkerî yên Fermandariya Artêşê ji Ajansa Nûçeyan a Nîcerê re gotin ku hêzên artêşê di operasyonên hevrêzkirî de, 11 kesên ku ji aliyê terorîstan ve hatibûn revandin; rizgarkirin.
Di heman demê de, li gorî çavkaniyan piştrast kirin ku hewldan hene ku hin kesên din ên revandî werin rizgarkirin.
Di pêşketineke berbiçav de ku şiyanên mezinbûyî yên komên terorîst fermandariya artêşê ragihand ku hêzên wê di çarçoveya Operasyona bi navê "Hadîn Kay"de dixebitin, êrişeke bi dronan ku baregeha operasyonê ya li gundê Delwa li herêma Konduga ya Eyaleta Borno, ku cihê koma "Boko Haram" û DAIŞ'ê ya wîlayeta rojavayê Efrîqayê; têk birin.
Li gorî çavkaniyan, çekdaran çar dronên tijî teqemenî bi kar anîne, lê hêzên artêşê bi awayekî serkeftî ew bê bandor kirin. Lewma operasyonên paqijkirinê hîn jî berdewam dikin da ku xala destpêkirinê were destnîşankirin û sûcdarên êrişê werin girtin, di heman dema ku hêzên li sektorên duyemîn, sêyemîn û çaremîn operasyonên xwe yên êrişê di çarçoveya kampaniya "Dizart Saniti 4" didomînin.
Di çarçoveyeke têkildar de, hêzên operasyona ewlehiyê ya "Sif Hifin" li dijî kesên sûcdar û zeviyeke madenê ya neqanûnî pêk anîn, di encamê de sê terorîst hatin girtin û tifingeke destçêkirî, cebilxane, jeneratorek û alavên ku di madenê ya neqanûnî de têne bikar anîn, hatin desteserkirin.

**Heta niha hejmara kuştiyan 12 kes in**

Ev şer bi awayekî bi tund berdewam dike, ku herî kêm 12 kes di êrişeke komeke çekdar a ne-



nas de li ser qadeke meydanê li herêma Ratuso Fan a Hikumeta herêmî ya Barkin Ladi li Dewleta Plateau hatin kuştin. Niştecihên xwecihî ragihandin ku 16'ê Kanûnê dema ku çekdaran êrişî cihê kar kirin, bêserûber gule barandin, di encamê de şer çêbû û hejmareke mezin ji karkeran reviyan. Rêxistina Perwerde û Çandî ya Berom diyar kir ku hîn jî çend kes jî winda ne.
Ev bûyer tevliheviya rewşa ewlehiyê li Nîcerê nîşan didin, hem metirsiyên terorê li bakur û rojhilat hem jî bi revandin û çalakiyên çeteyên çekdar li bakur û rojava tê kirin. Wekî din pevçûn û tundiya li herêmê yên girêdayî bi madenên neqanûnî li wîlayetên navîn.
Tevî serkeftinên leşkerî yên dubarekirî, çavdêr piştrast dikin ku derbaskirina pirsgirêkên dijwar ew e ku van destkeftiyan biparêzin û hevrêziya di navbera hewildanên leşkerî û pêşkeftina herêmî de xurt bikin. Da ku pirsgirkên aborî û civakî yên pevçûnê werin çareserkirin.

**Artêşa Nîcerê kuştina serçeteyekî terorîstan ragihandin**

Di pêşketineke din de artêşa Nîcerê kuştina serçeteyekî terorîstan, wênekêşê wî û hejmarek ji endamên din ên terorîst ragihand, di çarçoveya mîsyonên ku ji aliyê hêzên oprasyona "Hadîn Kay"ve li Eleyeta Brono, li bakur û rojhilatê Nîcerê hat kirin.
Di daxuyaniya 19'ê Kanûnê de hat ragihandin ku ji aliyê berpirsê agahdariya giştî yê Hêza Peywirê ya Hevbeş a Operasyona "Hadin Kay" ve hat dayîn ku di 18'ê kanûnê de terorîstek hat kuştin.
Daxuyaniya artêşê rave kir ku hêzan bi piştgiriya pergalên çavdêriyê yên pêşketî, tevgerên terorîstên ku ber bi herêmê ve diçûn tesbît kirin, ku bi dîsîplîna taktîkî û profesyonelîzma herî bilind, hêzan rê dan hêmanên terorîst ku bigihîjin qadeke şer a bi bandor.

# “Kes nebê Kurd dimir in Kurd jîn dibin, jîn dibin qet nakavê ala Kurdan”

Her welat û netewek xwedî sirûdeke neteweyî ye, gelê Kurd jî xwedî sirûda netewî ya bi navê ‘Ey Reqîb' e. Piştî bi dehan sal ji zordarî û bindestiyê, gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê piştî Şoreşa 19'ê Tîrmehê bi serfirazî sirûda xwe ya netewî dibêje.

**Aryan Hesen/Qamişlo**

Di sala 1945'an de, Partiya Demokrat a Kurdistanê di bin serokatiya Qazî Mihemed de hate damezrandin, bi armanca sereke ya bidestxistina xweseriya Kurdistanê bûye. Di 22'ê Kanûna duyemîn a sala 1946'an de, Qazî Mihemed bi fermî li meydana Çarçira ya bajarê Mihabadê ya Rojhilatê Kurdistanê bi amadebûna deh hezaran kesan ji hemû çîn û texên Kurdistanê bi fermî damezrandina Komara Kurdistanê ragihand. Ev bûyer bû cejnek neteweyî ya mezin. Ji bo cara yekem di dîroka nûjen de, Kurd karîbûn bibin xwedî hebûnek siyasî ya serbixwe bi ala xwe û sirûda xwe ya neteweyî, artêş û hikûmeta xwe. Herwiha hilbijartina sirûda “Ey Reqîb” wekî sirûda neteweyî yek ji biryarên sembolîk ên komarê bû. Komara Kurdistanê li Mihabadê û çawaniya hilbijartina sirûda “Ey Reqîb” wekî sirûda neteweyî, yek ji bûyerên herî girîng ên dîroka hemdemî a Kurd bû. Ew bûyere nîşaneya gihêştina xebata netewî a Kurd e bi qonaxekî nû ya siyasî û ferhengî.

Ey Reqîb Helbesta helbestvanê navdar ê kurd (Dildar) e ku di sala 1938'an de li zindanê hatiye nivîsandin, di demek kurt de di nav çalakvanên siyasî û xwendekarên li hemû beşên Kurdistanê de belav bû. Wezîrê Rewşenbîrî ya komara Kurdistanê (Menaf Kerîmî) û çend rewşenbîrên din pêşniyar kirin ku “Ey Reqîb” bibe sirûda fermî ya Komara Kurdistanê. Ev pêşniyar ji aliyê Qazî Mihemed û endamên hikûmetê ve bi germî hate pejirandin. Sirûd bi zelalî behsa mayîndebûna neteweya Kurd dike. Zimanê xwe sade û ji hêla her kesî ve hêsan bû ku were jiberkirin û gotin. Ew bi awazek bicoş û şoreşgerî hate danîn ku moral bilind dikir. Helbest berhema têkoşîna nifşek nû ya rewşenbîr û têkoşerên Kurd bû, ku li gorî ruhê komarê bû.

Yûnis Reûf, ku bi navê (Dildar) jî tê nasîn sala 1918`an li bajarê Koyê ya Başûrê Kurdistanê ji dayîk bûye û di 20'ê Cotmeha 1948 li Hewlêrê helbestvan, parêzer û çalakvanekî siyasî yê Kurd koça dawî kir. Sirûda Ey Reqîb di temenê xwe ya 28 saliyê de li zîndanê çêkiribû her wiha bi 2 sal berya mirina wî wekû sirûda nîştimanî ya komara Mihabadê hat pejirandin û heya roja îro li her çar aliyê Kurdistanê bi zaravayê Soranî û Kurmancî ji aliyê Kurdan ve bi sirûda nîştimanî tê naskirin.



Rohat Sîdo



Mihemed El Omer



Arye Kirat

**Sirûda niştîmanî a Kurdistanê**

Ey reqîb her maye qewmê Kurd ziman
Naşikê û danayê bi topê zeman
Naşikê û danayê bi topê zeman
Kes nebê Kurd dimirin
Kurd jîn dibin
Jîn dibin qet nakevê Ala Kurdan
Em xortên Mîdya û Keyxusrewîn
Dîn îman û ayîman her niştîman
Kes nebê Kurd dimirin
Kurd jîn dibin
Jîn dibin qet nakevê Ala Kurdan
Xortê Kurd tev hazir û amade ne
Canfîdane canfîdane her canfîda
Kes nebê Kurd dimirin
Kurd jîn dibin
Jîn dibin qet nakevê Ala Kurdan

Di vê çarçoveyê de Rêveber û xwendekarên dibistana amadehî ya Şehîd Omîd ji Rojnameya me re axivîn.

**‘Sirûda netewî ji nifşekî derbasî nifşên din bibe’**

Rêvebera dibistanê Rohat Sîdo diyar kir ku di heftê de du caran Sirûdê Netewî tê xwendin û wiha got: “Li dibistana Şehîd Omîd di hefteyê de du caran roja yekşem û pêçşemê Sirûda Netewî “Ey Reqîb” tê xwendin. 500 xwendekar di vê dibistanê de hene bi serbilidî, hezkirin û welatparêziyekî pir mezin, vê Sirûdê dixwînin, ji ber ku di xewn û xeyala me de bû ku em rojekê bi sirûda xwe ya netewî bixwînin. Ev gavek welatparêzî û netewî ye. Armanca me ku xwendekar hîs bikin ev sirûd bi xwîna Şehîdan û bi keda hevalên zindana derketiye pêş û bûye sirûda netewa Kurd. Ev sirûd di zindanê de hatibû çêkirin, ku xewn û xeyala wî bû ku bi sirûda xwe ya Kurdî bixwîne û em ê vê xewna wî ji nifşekê derbasî nifşekê din bikin.”

**‘Em bi serfirazî Sûrida xwe ya Kurdî dixwînin’**

Xwendekarê bi navê Mihemed El Omer destnîşan kir ku di dema dubarekirina Sirûda Netewî de ew heyecan digirin û wiha pê de çû: “Ez refa 12'emîn wêjeyî dixwînim, dema ku em vê Sirûda Kurdî dixwînin em hêz û heyecanê digirin. Ji ber ku ev sirûd li ser xwîna Şehîdan hatiye avakirin, di dema Rêjîma Baas de zarokên Kurd diçûn dibistanê Rêjîmê, bi erebî dixwendin û sirûdê rêjîmê digotin, lê niha û piştî Şoreşa Rojava ev sîstem hat guhertin em bûn xwedî dibistanê Kurdî û me bi serfirazî sirûda xwe ya netewî xwend û bi serbilindiyek mezin vegot. Dema ku em vê sirûdê dubare dikin em kêfxweş dibin, em ê her û her bi vê sirûdê xwe ya Kurdî berdewam bikin.”

**‘Wê hertin saza sirûda netewî bilindtir bibe’**

Xwendekara bi navê Arye Kirat da zanîn ku ew keçeke Kurd bi Sirûda xwe ya netewî serbilinde û wiha got: “Ez refa 12'emîn zanistî dixwînim, ez keçeke Kurdim ku dema em Sirûdê netewî dixwînim em bi kêfxwaşî û serbilindiyek mezin dibêjin. Çiqas hewilbidin ziman û sirûda me tune bikin, emê li hemberî wê dengê saza sirûda Kurdî bilindtir bikin. Herwiha dema ku em vê Sirûdê dixwînin em bi hesta azadiyê hîs dikin. Dema ku em sirûda netewî dibêjin em bi azadiya bajêr hîs dikin.”

# Ji navdêrên jinên Kurd; Fata Reş

**Zana Roj**

**Fata Reş di dîroka jinên Kurd de cihekî girîng digire. Ew seroka eşîrekê ji Mereşê bû ku li Rewanduzê dijiya. Di dema Şerê Qirimê de di sedsala 19'an de, wê 300 siwaran ber bi Stenbolê ve bir, bi Qesra Osmanî re hevdîtin kir û amadebûna xwe ya ji bo şerkirina li dijî Rûsan ragihand.**

Fata Reş, ku wekî Amazona Kurd tê nasîn, her çiqas roja ji dayîkbûna wê tam ne diyarbe jî tê payîn ku di destpêka salên 1880'an de li Navçeya Rewanduzê ya Hikumeta Herêma Federal a Kurdistana Iraqê ji dayik bû. Ew yek ji jinên Kurd ên navdar e, û cesaret, mêrxasî, bi otorîte û sekna wê di medyaya Brîtanî, Fransî, Almanî û Osmanî de hatiye nîşandan, ji aliyê herkesê ve pesnê wê hatiye dayîn. Fata Reş di dîroka jinên Kurd de cihekî girîng digire. Ew seroka eşîrekê ji Mereşê bû ku li Rewanduzê dijiya. Di dema Şerê Qirimê de di sedsala 19'an de, wê 300 siwaran ber bi Stenbolê ve bir, bi Qesra Osmanî re hevdîtin kir û amadebûna xwe ya ji bo şerkirina li dijî Rûsan ragihand.

**Bala tevahiya Geştiyaran kêşa**

Fermandareke leşkerî ya jin a Osmanî û siwarên wê ji hêla sultan ve li qesrê hatin pêşwazîkirina wan eleqeya li ser Fata Reş bêtir zêde kir. Hatina Fata Reş li Stenbolê bi siwarên xwe re bala herkesî kişand. Nivîskar, rojnamevan û rêwiyên Amerîkî, Fransî û Brîtanî yên ku demek kurt berî Şerê Qirimê gihîştin Stenbolê ji rêveçûna şer zêdetir Fata Reş balawan dikêşe. Fata Reş ku gelek tabûyên Osmanî bi xwe şikand, têgihîştina Rojavayî ya li ser romantîzm û jinan hilweşand.

**Hatina wê ya Stenbolê bi siwarîyên wê re tê xêzkirin**

Yek ji hunermendên bêhejmar ên ku bi wêrekî û qehremaniya Fata Reş bandor bûne, dîroknasê hunerî yê navdar ê Fransî Gusieppe Fossati bû ku wê demê Ayasofya nûjen dikir. Fossati hatina Fata Reş a Stenbolê bi siwarîtiya xwe re di gravurekê de xêz kir ku di 15'ê Nîsana 1854'an de li Fransayê di “L'lustration Journal Universel” de hate weşandin. Gravur “Kara Fatima, l'héroine du Kurdistan, a' Constantinople” an “Fata Reş, lehenga Kurdistanê, li Stenbolê” nivîsandiye. Her çend roja rastîn a mirina Fata Reş wekê Roja ji dayikbûna wê nayê zanîn jî, tê texmînkirin ku ew di destpêka salên 1800'î de çûye ser dilovaniya xwe .





# Xebatên salekê yên Însiyatîfa Azadiya Rêber Abdullah Ocalan a Sûriyê

Însiyatîfa Azadiya Rêber Abdullah Ocalan a Sûriyê di nava sala 2025'an de, ji bo azadiya Rêber Apo, piştgiriya banga Aştî û Civaka Demokratîk li ser asta Sûriyê û derveyî wê bi dehan çalakiyên cihreng lidar xistin. Em ê di vê raporê de kar û xebatên insyatîfê yê sala 2025'an û pilansaziya 2026'an ji were eşkere bikin.

**Viyan Egîd/Qamişlo**

Însiyatîfa Azadiya Rêber Abdullah Ocalan a Sûriyê destpêkê du navendên xwe li Qamişlo û Helebê dan vekirin, ji bo berfirehkirina xebatên insyatîfl navendek li bajarê Kobanê jî hat vekirin. Di heman demê de endamên insyatîfê li tevahî herêmên Sûriyê hene û xebatên xwe bi awayekî çalak didin meşandin. Helbet sala 2025'an jî ji bo xebatên insyatîfê pir girîng bû bi taybet piştî banga Aştî û Civaka Demokratîk ku bo rojeva cîhanê û girîngiya azadiya Rêber Apo a fîzîkî derket pêş. Di nava salekê de Însiyatîfa Azadiya Rêber Abdullah Ocalan a Sûriyê bi dehan çalakî li ser asta Sûriyê û cîhanî lidar xistin. Di vê raporê de jî em kar û xebatên Însiyatîfa Azadiya Rêber Abdullah Ocalan a Sûriyê yên 2025'an û plansaziyên sala 2026`an eşkere dikin.

**Xebatên Insiyatîfê yên sala 2025`an wiha ne:**

-Di nîqaşên li her sê navendên Insiyatîfa Azadiya Rêber Apo, bal hat kişandin ser girîngiya rol û felsefeya Rêber Apo di çareserkirina pirsgirêka Kurd û bidestxistina aştiyê li Rojhilata Navîn de, herwiha banga kampanyaya cîhanî ya ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan û şandina peyaman ji rêxistinên navneteweyî û serokên dewletan re hate kirin.

-Rêxistinên navneteweyî yên ku serdana navenda Insiyatîfa azadiya Rêber Apo kirin, Hejmara wan 18`e bûn. Ji wan şandeyên herî girîng yên Fransî, Alman û şandeyek ji Vatîkanê û amadebûna Metranê Makar Aşkareyan, Sermetranê Ermenî Ortodoks ê Helebê û yên girêdayê wê, di heman demê de şandeyek Meilûlî Elesqef, Metran Mîtropolît a Heleb û Eskendiron û deverên girêdayên wê, peymangiha Gotêh, her wiha navenda Çandî ya Elmanî ya li Şamê û şandeya Meclisa Mala Êzîdî bûn.



**Serdanên insyatîfê yên derve:**

-Iniyatîfa Azadiya Rêber Apo serdana Lubnanê kirin, bi rewşenbîr û nivîskarên Lubnanî re civiyan ku helwestên erênî li ser tevlîbûna kampanyaya cîhanî ya azadiya Rêber Apo derket pêş. Di heman demê de axaftinek di çalakiyeke giştî de ji bo pîrozkirina rojbûna Rêber Apo li Beyrûtê hate kirin.

-Hevdîtin bi Kombenda Girtiyên Siyasî ya Lazqiyê re çêbû, bi tevlîbûn û beşdarbûna 42 kesayetan.

-Li Şamê bi Komeleya Jinan a Alaq, Komeleya Çand û Mîrateya Kurd a Osman Sebrî re civînek pêk hat, herwiha li gel hin siyasetmedar, çalakvanên jin û parêzvanên mafên microvan.

-Vexwendinek hatitbû kirin ku Insiyatîfa Azadiya Rêber Apo beşdarî Konferansa Cîhanî ya Azadiya Rêber Apo bibin û ew konferans li Romayê pêk hat, lê ji ber ku vîze ji wan re nehat dayîn, ew nekarî bûn beşdar bibin.

**Çalakî, kar û xebat**

-Encama kampanyaya ‘Daxwaza Hevdîtinê bi Rêber re bikim' 2 hezar û 541 kes îmze bûn, di nav de akademîsyen, bijîşk, çalakvanên mafên siyasî, nivîskar, rojnamevan, rewşenbîr, şêx û rûspiyên eşîretan hebûn.

-Peyama Rêber Apo ji şêx û kesayetên rûsipiyên eşîrên Ereb ên deverên Reqqa, Tebqa û Dêrezor re hatin şandin. Hijmara wan peyamên ku hatin şandin 469 in.

-Civîn li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo û banga Aştî û Civaka Demokratîk li Heleb, Şêxmeqsûd û Eşrefiyê pêk hat, di nava salekê de 24 civîn pêk hatin.

-Herwiha di salekê de 5 komxebat û semîner li ser azadiya Rêber Apo û pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk hatin dayin.

-520 pirtûkên Rêber Apo ji siyasetmedar, rewşenbîr, çalakvanên mafên mirovan, rûsipî û şêxên eşîran û li mêvanan hat belevkirin.

-Di nava salekê de 455 caran beşdarî ragihadinê bûn, mîna Rojname, TV û Ajans.

- Têkilî bi 603 kesayetên navdar û girîg ên li hundir û derveyî Sûriyê re çêbû.

-Têkilî bi 346 kesayetên girîng û navdar re ên di Rojhilata Navîn de çêbû.

-54 Peyamên ji bo rêxistinên navnetewî û sivîl, herwiha ji rêber û encûmenên cîhanî û herêmî re, ev in: Mêrên Misilman- Xiristiyan - Serokên dewletên Ereb, Neteweyên Yekbûyî û rêxistinên wê - Yekîtiya Ewropa û rêxistinên wê- Serokên dewletên ku beşdarî kompoya navneteweyî bûn e; hatin şandin.

**Plansaziya sala 2026`an wiha ye:**

1- Berdewamkirina şopandina rewşa Rêber Apo, di heman demê ji bo azadiya Rêber Apo ya fîzîkî wê daxuyanî ji raya giştî re were xwendin û şandin.

2- Wê têkilî bi hevalên Rêber Apo re were kirin, bi vê girêdayî her 3 mehan wê civîn bi wan re were çêkirin.

3- Wê têkilî bi rêxistinên sivîl, mafnasî û civakî yên li Ewropayê û Rojhilata Navîn li ser esasê azadiya Rêber Apo ya fîzîkî wê were kirin.

4- Wê panêl, semîner, Konferans û konger ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo were li darxistin.

5- Wê hin semîner ji bo serokên Eşîreyên Ereb li ser bingeha netewa demokratîê wê di destpêka meha Sibatê de were dayin.

6- Di meha tebaxê de wê têkilî bi serokên dewletên Ereb û meclisên tevahî dewletên di Rojhilata Navîn de wê were çêkirin.

7- Wê di meha Sibatê de name ji bo hemû dewletên ku tevlî kompoya nevneteweyê bûn, wê were şandin.

8- Di meha Sibatê de semîner li ser rola Eşîreyan di avakirina Netewa Demokratîk de were dayin.

9- Wê xwepêşandanek di heman wextî de li tevahî cîhanê ji bo mafê heviyê were pêk anîn.

10-Di 4`ê Nîsanê de ku di wê roj rojbûne Rêber Apo ye, ji bo vê rojê wê meşên girsayî di 77 dewletên cîhanî pêk were.

Herwiha wê de sala 2026`an bal li ser 4 xalên girîng were gişandin û girîngî jê re were dayên, ew jî ev in;

- Bi dawîkirina tecrîda li ser Rêber Apo
- Doza Rêber Apo, bûye dozekî cîhanî
- Mafê hêviyê
- Azadiya Rêber Apo ya fîzîkî

Di vê çarçoveyê de Rêveberê Insiyatîfa Sûrî a Azadiya Rêber Apo Ferzende Munzir ji rojnameya me re diyar kir ku banga Rêber Apo a bi navê aştî û civaka demokratîk bangeke dîrokî bû, ev bang weke destpêka çareseriyê ji pirsgirêka hemû gelan e û wiha got: “Sala 2025`an salekî dîrokî bû ku Dewlet Bexçelî daxuyanî da û di nava daxuyaniya xwe de bang li Rêber Apo û PKK kir ku xwe fesix bike, ji ber ku da zanîn ku tirk û kurd birayên hev yên hezar salî ne. şûne çek û şer, bi rêya siyaset û diyalogê re çareserî were çêkirin. Li ser vê esasê Rêber Apo di 27`ê Sibata 2025`an de banga Aştî û Civaka Demokratîk kir, bi ragihandina vê bangî gelek guhertin û veguhertin di Rojhilarta Navî de hat çêkirin ku heya roja îro banga Rêber Apo ya Aştî û Civaka Demokratîk ji bo tevahî alozî û pirsgirêkên di Rojhilata Navî de, çareseriya. Banga Rêber Apo a bi navê aştî û civaka demokratîk bangeke dîrokî bû, ev bang weke destpêka çareseriyê ji pirsgirêka hemû gelan e û bi taybet gelê kurd re ye. Pirsgirêka kurd bi rê û rêbazên nû bi rêbazên herî demokratîk, aştî û şaristanî ku hemû gel li hêviya wê bûn, tevahî cîhan li benda vî bangî bûn ku pêk were. Cara yekemîn e ku Neteweyên Yekbûyî, Yekîtiya Ewropayê, hêzên cîhanê, Çîn, Rûsya, Fransa, Almanya, Brîtanya, dewletên Rojhilata Navîn û tevahî kurd bi awayekî erênî li vê bangê dinêrin. Ev banga wê li pêşiya gelek felaketan bigire, wê bibe riya ronî û azadiyê ji bo tevahî gelan. Li ser vê esasê banga Rêber Apo sala 2025`an kir salekî dîrokî û bi bi wate. Niha jî em Insiyatîfa Azadiya Rêber Apo ya Sûrî, hewldanên pir mezin didin meşandin ku em xwedî li banga Rêber apo derkevin û destekê bidin Rêber Apo da ku ev bang bi cih were, pêwîst e em ji Rêber Apo re bibin hêz.”

المبادرة السورية لحرية القائد عبدالله اوجلان
ÎNÎSIYATÎFA AZADIYA RÊBER ABDULLAH OCALAN A SÛRYÊ
INITIATIVE “FREEDOM FOR ABDULLAH OCALAN” IN SYRIA
2019.10.09

# Li heremên dagirkirî îdeolojiya DAIŞ'ê fêrî zarokan dikin

**Piştî hilweşandina rejîma Baasê û hatina hikumeta veguhêz li ser desthilatdariyê, wê dest bi guherandina mufredatên perwerdehiyê kir, di serî de li Minbic û piştre li gelek bajarên girêdayê desthilatdariyê û bi pêşengtiya Haşim Ebû Cabir ê DAIŞ'î îdeolojiya DAIŞ'ê tê fêrkirin.**

Navenda Nûçeyan

**Bi mufredata DAŞ'ê re hat guhertin**

Mufredata ku ji 12 rûpela ya weşandî ku ji hêla Wezîrê Perwerdehiyê yê hikûmeta demkî ya Şamê Nezîr Mihemed el-Qadrî ve hatiye îmzekirin, xuya dike ku tenê li ser esasên bin navê Îslamî de lê bingeha xwe ji îdeolojiya DAIŞ'ê digire ye.
Hevoka "parastina welêt" bi "parastina Xwedê" hatiye guhertin. Wezaretê teoriya pêşveçûnê (Gerdûnê) ji bernameya biyolojiyê derxist. Hemû beşên li ser şaristaniyên kevnar û kesayetiyên dîrokî ji pirtûkên dersê hatine jêbirin. Kesayetiyên dîrokî yên wekî Şahbanû Zenobiya ya Împeratoriya Palmîra ku di sedsala 3'an de li Sûriyê hukum kir û Xewla bint el-Ezwar êdî nayên hînkirin.
Di bernameya nû de, hevoka "kesên ku xezeb kişandin û yên ku rêya xwe winda kirin" di Sûreya El-Fatiha de tê pênasekirin, bi Cihû û Xiristiyanan ve hat têkildarkirin û rakirin. Dersên perwerdehiya olî ji bo ketina zanîngehê mecbûrî bûne. Hevoka "parastina welat" bi "parastina Xwedê" hatiye guhertin. Her çend ev aliyên mufredata nûkirî yên eşkerekirî ne jî, îdeolojiya DAIŞ'ê li deverên ku ji aliyê milîsên ku ji aliyê dewleta Tirkiyê ve tên piştgirîkirin û HTŞ'ê ve tên kontrolkirin bi dizî tê hînkirin.
Li gorî agahiyên ku ji aliyê malpera Lêkolîn org.. bidestxistî, piştî dagirkirina Minbicê ji aliyê komên çete yên ku ji aliyê dewleta Tirkiyê ve tên piştgirîkirin, hikûmeta demkî ya Şamê ya Haşim Ebû Cabir ku endamekî berê yê çeteyên Cebhet el-Nusra û DAIŞ'ê bû wekî serokê herêma Minbicê tayîn kir. Piştî ku dest bi kar kir, Ebû Cabir dibistan vekirin ku tê de qaşo perwerdehiya olî dihat dayîn. Lêbelê, hatiye hînkirin ku îdeolojiya DAIŞ'ê di van dibistanan de ku bi eşkereyî ji bo hînkirina Îslamê hatine veqetandin, tê hînkirin.



Gelek mamosteyên ku ji aliyê Ebû Cabir ve hatine tayînkirin rasterast ji aliyê wî ve têne çavdêrîkirin. Yek ji wan dibistanan dibistana Gazî el-Ezza ye li bajarokê Ebû Qelqel a Minbicê ye. Li gorî agahiyên me bidest xistine, zêdetirî 100 zarokên di navbera 7 û 16 salî de li gorî îdeolojiya DAIŞ'ê têne perwerdekirin. Mamoste bi xwe ji aliyê Ebû Cabir ve ji Wezareta Şerîetê ya di bin hikûmeta Şamê de têne hilbijartin.
Dibistanek din ku îdeolojiya DAIŞ'ê bi awayekî çalak tê hînkirin El-Îman e ku li Kolana Helebê li navenda Minbicê ye. Hat hînbûn ku keç jî li vê dibistanê perwerde dibin û ev perwerde ji hêla jinên ku berê li Reqayê perwerdehiya îdeolojiya DAIŞ'ê dîtine ve tê dayîn.

## Tovên Yekîtiya Gelan



Farûk Sakik

Dema ku Împeratoriya Osmanî hildiweşiya, tenê neteweya ku dixwest li kêleka Tirkan bimîne, Kurd bûn. Neteweyên din dixwestin ji împeratoriyê veqetin.
Mixabin, kadroyên ku komar avakiri bûn, bi heman dilsoziyê li hember Kurdan nesekinîn. Li Tirkiyê bi tenê ev dijminatiya wan tune bû di heman demê de, di dewletên wê demê çêkirî (Iraq, Sûrî) de jî li ser Kurdan zext dikirin.
Dewleta Tirk, her dem Kurdên, ku bi sedan salan bi wan re biratî parve kiribûn tercîh nekirin. Kesên wek Sedam, Esad û rejîma Îranê hilbijartin. Ev yek ji dînamîkên bingehîn ê girêdanên biratiyê şikand û Kurdan ji dewleta Tirk dûr xist.
Kurdan sed sal e li hember vê helwesta -dijminatiya wan serî hilda.
Salek berê ji bo Kurd ji nû de nêzî Tirkiyê bibin pêvajoyek dest pê kir. Li ser vê yekê serhildana PKK'ê jî derbasî qonaxeke nû dibû.
Lê AKP'ê îroj wê siyaseta bapîrên xwe ya berê dişopîne. Ji bo li Bakurê Kurdistan de di mafên Kurdan de gavên erênî nabêje, berê xwe dide Sûrî. Berê xwe dide QSD'ê. Berê xwe didide Rêveberiya Xweser.
Dîsa li serê me bûn bela. Gotinên peyamên, axaftinên salek berê hemû derew bûn. Me digot dive ku ji dîrokê dersek girtibin û hatibûn guhertin. Na, hîn jî wek xwe bi kodên sed sal berê tevdigerin.
Dijminatiya Kurdan bi rêbazeke cuda didin meşandin. Aha wa heyetên wan dîsa li Şamê ne. Di 22'yê Kanûnê de, Wezîrê Karê Derve yê Tirkiyê Hakan Fîdan, Wezîrê Şer ê Tirkiyê Yaşar Guler û Serokê MÎT'ê Îbrahîm Kalin çûn Şama paytexta Sûriyê.
Ji bo derbasî qonaxa duyemîn ya aştî û civaka demokratîk nebin, li hinceta digerin. Dest bi gefxwarina qirkirin komkujiyan kirine.
Komîsyon hat avakirin û partiyên ku di komîsyonê de cih digirin, raporên xwe pêşkêşî Serokatiya Meclisê kirin. Di rapora AKP'ê de sedemên Pirsgirêka Kurdan nehatine nirxandin û pirsgirêk dîsa wekî "pirsgirêka terorê" hatiye pênasekirin.
Her çend Kurd ji sed sal berê xwedî tecrûbe bin, rêxistintir kirî û hebûneke dîplomatîk a bihêztir hebe jî, ew careke din tercîha xwe ya ji bo jiyaneke demokratîk a hevpar bi Tirkan re nîşan didin.
Rêber Apo ev pêngav ji bo vê yekê da destpêkirin. Ev saleke bi sebir û bi fedekariyeke mezin li benda gav avêtina wan e.
Ger destê ku ji hêla Rêber Apo ve hatiye dirêjkirin neyê qebûlkirin, an jî bi îstismar were bikaranîn, girêdana di navbera Kurd û Tirkan de jixwe qelsbûyî bi tevahî were qûtkirin. Ev dibe ku ji bo Kurdan ne baş be, lê ji bo Tirkan wê diha zêde xirab be.
Kurd li bakurê Kurdistan dest bi rêxistibûna siyaseta demokratîk kirine. Li her derî civîn û panel tên lidarxistin. Civak bi pêvajoyê tê fahm kirin. Di her warî de ji bo mafê xwe yên kolektîf bi dest bixin di nav hewldanan de ne. Ji bo Kurdan veger û sekn tune. Ew pêvajoyê bi dawî bikin jî Kurd wê dewam bikin.
Ji aliyê dewletê ve bi israr gav neyên avêtin. Pêvajo li gor berjewendiyên xwe bi kar bînin jî wê nikaribin vê serdema nû bidin seknandin. Êdî civaka ku li Tirkiyê jehrî kirine jî ji bo çareseriya doza Kurd rastiyan dibîne.
Tirsa Erdogan a wê carek din nikaribe bibe desthilatdar û Tirkiyê ber bi felaketên mezin ve bibe, ji aliyê herkesî ve tê dîtin. Ji bo vê yekê desteya ku çûye Şamê divê berê xwe bide Qamişlo, bi rêveberiya xweser re hevdîtinan pêk bîne. Tovê yekîtiya gelan li Şamê nayê çandin, vegerin li Qamişlo em vê tovê biçînin.

## Şer an Biratî?



Zekî Bedran

Desthiladariya Tirkiyê bênavber dixebite ku Sûriyê bixe nav dorhelekê şerekî nû. Ew bi Îmraliyê (girtîgeha ku Rêber Abdullah Ocalan lê dîl tê girtin) re hevdîtinan dikin, qaşo ji bo bidawîanîna şer. Ew qala biratiya Kurd û Tirk dikin. Ev nîqaş gihîştine wê astê ku komîsyona parlementoyê guhdarîkirinên xwe qedandine û raporekê encamê amade dike. Di van raporan de, AKP û MHP di derbarê çareseriya pirsgirêka Kurd de tiştek berbiçav negotine. Tevî van hemû astengiyan, pêvajo bi awayekî berdewam dike. Lê, hikûmet û hevkarên wê bi israr xeta dijminane di derbarê Bakur û Rojhilatê Sûriyê de didomînin. Çapemeniya şerê taybet a Tirkiyê zimanê ku bi armanca wê afirandina hawîrdorek aram an jî avakirina bingehek civakî, bikar nayin e. Berovajî vê, Rojava wekî gef tê nîşandan û zimanek şerê taybet tê bikar anîn. Wezareta Parastina Netewî ya Tirkiyê di daxuyaniyên xwe de bi berdewamî zimanê gefê bikar tîne. Wezîrê Karên Derve yê Tirk Hakan Fîdan xuya dike ku bi taybetî ji bo pirsgirêka Sûriyê hatiye erkdar kirin; her ku diçe, ew li ser QSD'ê û Rêveberiya Xweser dike rojeva xwe de û gefê li wan dixwe. Di daxuyaniya xwe ya dawî de, Wezareta Parastina Netewî dibêje ku QSD'ê dê di nav artêşê de were entegre kirin, lê ew vê yekê bi şêwazê tîm na pejirînin; ew ê bi awayekî yekinî beşdar bibin. Lê, di hevdîtinên xwe yên bi hikûmeta veguhêz ya Şamê re, QSD li ser beşdarbûna bi şêweyê 3 tîman û hwd. li hev kiribûn. Hikûmeta vegûhêz ya Şamê vê yekê erenî nêz dibe, lê Wezareta Parastina Netewî ya Tirk dibêje na. DYA di van danûstandinan de roleke çalak dilîze. Lê hikûmeta Tirkiyê van hemûyan paşguh dike û nêrînên xwe li ser Sûriyê û aliyên peywendîdar ferz dike.
Tirkiye berjenwdiyên xwe yên ewlehiyê li ser pêşeroja Sûriyê girîngtir dibîne. Ew bi tevahî hebûn û ewlehiya gelê Kurd nedîtî we tê. Wekî din, QSD ji bo Tirkiyê tu gefê çênake; ew ji bo vê armancê jî nehatiye damezrandin. Tirkiye xwediyê 2'emîn artêşa herî mezin a NATO ye. QSD weke hevkarê Hevpeymaniya Navdewletî li dijî DAIŞê şer kir û gelên li herêma xwe diparêze. Ji bilî vê, ew beşdarî ti çalakiyên din nebûye. Wekî din, artêşên mezin, hêza esmanî û hwd. tine ye. Herêma Rêveberiya Xweser û QSD, rastî êrîşên artêşa Tirkiyê ve rû bi rû mane, di encamê de herêmên wekî Efrîn, Girê Spî, Serêkaniyê û Minbicê hatine dagirkirin. Beşek mezin ji Sûriyê di bin serweriya dagirkeriya leşkerî ya Tirkiyê de ye. Desthiladariya Tirkiyê li gorî pîvanên biratiyê bi Kurdan re tevnagere. Ew qala vê yekê dike, lê pratîka wê bi tevahî berovajî ye. Di pratîkê de, dijminatiya li dijî Kurdan berdewam dike. Bi dîtina komkujiyên Elewî û Durzî, bêçekkirina Kurdan dê wekî vekirina deriyên qirkirinê be. Gelo ger Kurd wekî bira werin hesibandin, ma divê dewleta Tirkiyê van birayan neparêze û hewl nede ewlehiya wan mîsoger bike? Wan ji bo Tirkên Qibrisê hemû cîhan dagir kir. Ew 50 sal in ji bo avakirina dewletek Tirk li ser wê girava piçûk dixebitin. Lê ew "birayên xwe yên Kurd" jî dixin nav pencên HTŞ'ê de. Rewşenbîr û derdorên demokratîk ên Tirk pêşketinan ji dûr ve dişopînin. Ew li hember Kurdan bêxem û sist in. Ma ew xem nakin ku Kurdên Sûriyê ji komkujiyê re bêparastin û di bin hişmendiya HTŞ'ê de bihêlin? Ma ev dijminatiya kûr ji rêzê bûye û navxweyî bûye? Çima HTŞ ji Kurdan nêzîktir Tirkiyê tê dîtin? Çima danûstandin û bijarteyên wan ên siyasî her tim bi HTŞ'ê re ne? Ma derdorên siyasî û rewşenbîrên Tirkiyê van pirsan ji xwe nakin? Erê, ev pirs dikarin pir zêde bibin. Wekî din, dema ku pirsgirêka Kurd û bidawîkirina şerê çekdarî di rojevê de ne û li Tirkiyê têne nîqaş kirin, amadekariya komkujiyan li dijî Kurdan li Sûriyê nikare wekî ji rêzê werin dîtin. Li Tirkiyê biratî û li Sûriyê dijminatî nikare di nav hew de bê meşandin. Yên ku li Sûriyê dijminatiyê nîşan bidin, dê li Tirkiyê jî dijminatiyê nîşan bidin. Ji bo vê yekê ravekirinek din tune ye. Tirkiyê, di bingeh de, Kurdan nas nake û ne pejirandiye jî. Ji ber vê yekê, naxwaze statuyek wan a fermî jî hebe. Ew hewl dide ku rê li ber wan bigire ku li Sûriyê mafên xwe yên zagonî û destûrî bi dest bixin. Yekbûna QSD û Rêveberiya Xweser di nav dewleta Sûriyê de ne pêvajoyek yekalî ye. Peyman saziyên siyasî, destûrî û navendî jî di nav xwe de digir e. Tirkiye, van hemûyan ji nedîtî ve tê, dixwaze tenê li ser QSD bisekine û Rêveberiya Xweser ji holê rake. Peyman ne xalekê tenê ye ku tenê li ser QSD hatiye amadekirin. Wekî ku tê dîtin, dewleta Tirkiyê dixwaze Sûriyê radestî hişmendiya tarî ya HTŞ'ê bike. Ew dibêje, "Bila Kurd tune bin, bila hebûna wan neyê mîsogerkirin; bila HTŞ, El Qaîde û DAIŞ li ser desthilatdariyê bin." Tirkiye bi awayekî çêker nêzî yekbûnê nabe. Ew rolek avaker nalîze. Ew helwesta xwe ya yekdest û tûndrew didomîne. Li şûna DYA, ew dikare wekî navbeynkar tevbigere û çareseriyê hêsan bike. Li şûna vê yekê, ew ji bo şer amadekariyan dike û gefên xwe naqedîne. Ji bilî hemî nêzîkatiyên xwe yên neyînî, hikûmeta Tirkiyê, ji Rêber Apo jî dixwaze ku bang li QSD'ê bike ku çekên xwe deyne. Li şûna ku nêzîkî Rêber Apo bibin, ew Rêber Apo hîna jî dîl digirin. Di vê rewşê de, kî/ê dê baweriya xwe bi Tirkiyê bîne, û Îmralî çawa dikare rolek erênî bilîze? Pêşî, divê hikûmet helwesta xwe zelal bike.



# Ji çiraxên wêjeya Kurdî

Can Yûsiv



Helbestvan Narîn Omer
"Çavkaniyeke ji tîpên bedew, û bux-çeyek ji wateyên pîroz"

Helbestvan û nivîskarên jin ên Kurd di serdema ku peyv bi sînor bû û tîp qedexe bû wan roleke pêşeng lîstin, pênûsên xwe kirin xetereyên hişyarî û berxwedanê, tîpên xwe kirin bin xizmeta gelê xwe û doza wî de û di tariya zordestî û bindestiyê de rê ronî kirin bi diwêta pênûsên xwe .
Bi wê yekê wan karîbûn mîrasa çandî û wêjeyî ya neteweya Kurd biparêzin û ziman û nasnameya Kurdî zindî bihêlin dûrî ji windabûn û pijavtinê, bi rêya gotin û helbestên xwe yên ku tê de derbirîna têkoşîna bav û kalan û xewnên nifşên paşerojê dikirin.
Helbestvana Kurd Narîn Omer yek ji wan helbestvanan tê hesibandin ku pênûsa xwe li hember zilm û zordaran kirine çek û jiyana xwe terxan kirine ji bo azadî û rûmetê û parastina nasnameya Kurdî ji windabûn û jibîrkirinê .
Di dilê bajarê aram ê Dêrikê de, hevcêwiya Cizîra Botan û Zaxoka Bahdînan, ew gewhera Kurdî ku dikeve di navbera Bakur, Başûr û Rojava yê Kurdistanê de , ku çemê Dîcle bi hêzû kêferara xwe wan ji hev vediqetîne, bi pêlên xwe yên azad sirûdên mandariyê distirê û awazê sermedî li peravên dîrokê lêdixe , çiyayên Cûdî û Bêxêr mîna bazeyan ji mêj ve wê diparêzin.
Ew bajarê ku di dirêjahiya dîrokê de bû dergûşa olên esmanî, û wargehê şaristanî û çandên cuda û kevnare ku mohra xwe li ser kevir û mirovan hiştibûn, û kevir û zinarên wê hîn jî bi ruhê Med û Suberiyan di pestînin, û bêhna mîrateya Mîtaniyan û Hûriyan ji axa wê dibare.
Û li vî bajarê ku di dirêjahiya serdeman de sembolên wêje û ramanê anîne jiyanê mîna (Ehmed Şêx Salih, Omer Lalî, Lorî Taldarî )û yên din ji nivîskar û helbestvanên ku bi ronahiya gotinên xwe û afirîneriya giyanên xwe asîmanê edebiyata kurdî ronî kirine, li ser vê xakê pîroz helbestvana kurd Narîn Omer di sala 1967'an de ji dayîk û bavek Kurd (Omer Sêfidîn û Hediya Melek) , di nav malbateke kurdperwer ya kedkar û welatparêz de, ku ji pênc xwîşk û du birayan pêk tê hatiye dinyayê.
Hemû bi nirxên welatparêziyê, di maleke bi hezkirina ji bo welat û ku ala Kurdayetiyê wek sembola rûmet û wefadariyê tê de hatiye bilindkirin, mezin bûne.
Dê û bavên wan ew mezin kirin ku xak ne tenê ax e, lê ew bîranîne, nasname û xwîn e ku di damarên wan de diherike û zimanê kurdî dayîka hebûnê û kilîta mandariyê ye.
Bavê wê yek ji kesayetiyên naskirî yên netewî li bajarê Dêrikê bû, û ji ber helwestên xwe yên niştimanperwerî, rastî zîndan û îşkenceyê hat û di sala 1969'an de koça dawî kir û heft zarok li pey xwe hiştin û Narînê di wê demê de piçûk bû û temenê wê ne zêdeyî du salî bû.
Narîn zarokatiya xwe di hembêza bajarê Dêrikê de derbas kir, şarê ku di hembêza çiyayên Cûdî û Qerejoxê de radize û bi henaseyên çemê Dîcleyê û bi pestînên pirpirîkên bedew şiyar dibe.
Ew di kolanên wê yên teng û taxên wê yên kevnar de, yên ku bêhna nanê teze û hêlma axê şilbûyî bi xunava serê sibê jê dibare , û di nav kavilên qijleya Firinsî de, ku her kevirek yê wê çîroka demeke dirêj vedibêje, û li qiraxa kaniya leşkerî, ku jin û keçan cih tijî jiyan dikirin û cerên avê di destên wan de dibiriqin, ken û sohbetên wan bi awazên bayê re direqisin, germ û ronahiyê li asoyê dibarînin, mezin bûye.
Di hembêza xwezayê de, di nav çîrokên bav û kalan û dengê jinan de, yekem hişmendiya Narînê geş bû û evîna ax, ziman û nasnameyê di giyanê wê de derket holê û azweriya peyvê di dilê wê de çêbû, ku piştre bû vedenga azadî û rûmetê di helbest û çîrokên xwe de .
Hewesa Narîn ya ji bo wêjeyê di zarokatiya wê de dest pê kir, di bin bandora birayê xwe, helbestvan Adil û pirtûkxaneya wan a tije pirtûk, ku ji danişînên wî bi hevalên xwe re ew fêrî zimanê peyvê bû, kûrahiya vegotinê fam kir, nirxên raman û azadiyê di rihê wê yê ciwan de hate çandin û bi wê re dest bi rêwîtiya dirêj a ber bi afirînerî û gotina azad kir.
Narîn welatparêzî ji çavkaniyên bavê xwe û hişmendiya wêjeyî ji birayê xwe girtiye û bi piştgirî û handana xwişka xwe Perîxan gavên xwe yên pêşî avêtiye , ruhê wê bi kurdayetiyê û hezkirina ax û ziman ve tijî bûye.
Wê ji lavijên dêran, sirûdên mizgeftan, û bangdana Mela Hemdiya, ji awazên Cemal Sadûn, stranên jinan ên di dawetan de, û dengên tevr û bêran
li nav zeviyan de , peyvên herî paqij ên ku helbestên xwe pê xêz dike wergirtiye û xêzên afirîneriyê bi tîpên zêrîn vehûnandiye.
Wê ji xuşîna kaniya leşkerî, xumxuma çemên Safan û Dîcleyê û çîrokên dapîran ên şevên dirêj ên zivistanê de, ruhê xwe yê afirînerî û kûrahiya ezmûna xwe ya wêjeyî wergirtiye , lewra nivîsên wê bûne çîrokên zindî û mîrata nasnameya kurdî digihîne her dilê ku dixwîne.
Wê xwendina xwe ya seretayî, amedeyî û navîn li dibistanên bajarê Dirikê qedandiye, paşê Wêjeya Erebî li zanîngeha Şamê xwendiye, û di sala 1995'an bi dawî kiriye , zêdetirî bîst û pênc salan ji jiyana xwe terxan kir ji bo karê perwerdehiyê, di navbera qonaxên perwerdehiyê yên cihêreng de derbas kiriye, ruhê zanînê û hezkirina ziman di nav nifşên li pey hev ên xwendekar de belav kiriye.
Di heman demê de wê di qada çandê de jî çawa ku li erdeke tî gul tê çandin, wê peyvê diçandin, di gelek xebatên perwerdeyî, çandî û civakî de cih girtiye û wêje ji bo wê bû pencereya azadiyê û penageha giyan.
Wê rêwîtiya xwe bi peyvê re di pirtûkxaneya mala xwe de û di nav berhemên helbestvanên Kurd, Ereb û Navneteweyî de dest pê kir, di sala 1980 de, piştî mirina diya xwe, helbestên xwe yên yekem dinivîse û ji malbat û hevalên xwe re dixwîne ,wê kêlî zayîna wê ya rastî bû, ji hingê ve Narîn dev ji nivîsandinê bernedaye. Helbest jê re bû mal û welatek û riste jî bû hevrêya giyan û neynika wijdanê.
Narîn nivîsên xwe bi Kurdî û Erebî dinivîse. Wê helbesta klasîk, helbesta azad, nûjen û pexşan nivîsiye. Şarezayiya wê tenê bi nivîsandina helbestan re sînordar nema,wê roman û kurteçîrok jî dinivîsand û mijarên wê cûr bi cûr bûn di navbera evîn, hesret, welat, azadî, jin û bîranînê de.
Îro, wê zêdetirî çardeh pirtûkên çapkirî hene, di nav de helbest, roman û lêkolînên edebî, di nav de:
1-Perîxana min" Helbest- bi zimanê kurdî
2- "Hinga bêdengî can dikêşe" Helbest- bi zimanê Erebî .
3- "Çaxê derbideriya ber bi rojava " Roman- bi zimanê Erebî.
4- "Axoşkirina Pênûsê û demsalên giyan " Roman bi zimanê Erebî
5-"Kenê Şanya" Helbestên zarokan- bi zimanê kurdî -2018
6- "Henaseyên Jiyanê" Roman bi zimanê Kurdî.
7- "Pistepistên bîrîranê"-Roman bi zimanê Erebî.
8- "Tîrêjên vejînê" li ser hunermend û dengbêjên kurd yên jin 2019.
9-"Çavên Dil" Helbest- bi zimanê kurdî 2020.
10- "Navdarên Kurd" bi hevkariya nivîskar û dîroknas Behcet Ehmed sala 2021
11- " Rojpirtûka Diya min" kurte çîrok bi zimanê Erebî- 2023
12- " Çavên dil" Helbest - wergerandin bi zimanê Ingilîzî - 2023



13- "Pencemora evîndaran" Helbest wergerandin bi zimanê Elmanî/ -2023
14- Pirtûkek hevbeş bi çend nivîskaran re bi navê" Mirovên ku dîrokê ew dadperwer nekir" 2025.
Ji bilî berhemên wê yên çapkirî, zêdetirî panzdeh destnivîsên wê ji bo çapê amade ne, di nav wan de çîrok, roman û lêkolînên wêjeyî û civakî hene.
Narîn Omer beşdarî di damezrandin û rêvebirina hejmarek kom û yekîtiyên çandî û civakî de li bajarê Dêrikê kir, wek: (Baxê Jinên Dêrika Hemko, Tevna Çand û Hunera kurdî , Hevbenda nivîskarên Dêrikê û Koma Dêrik ya Çandî).
Û niha ew:
1- Endama komîta rêvebir ya Yekîtiya" nivîskar û rojnamevanên kurd li Sûriyê ye.
2- Endama Komela "Jiyan" û Yaneya Çand û Huner ya "Jiyan e".
3-Endama komeleya " Hinar" yand çand û wêje ye.
4- Endama komeleya "Çanda Bê Sînor" li Almanya ye.
5-Endamê komeleya ku li Karlsruheyê projeyên însanî piştgirî dike.
Narîn Omer ji ber keda wê ya zêde di qada edebiyata kurdî de gelek xelat û spasname ji dezgehên çandî wergirtine, ji wan:
1- Xelata Seydayê Tîrêj ya helbestê (2006).
2- Xelata Festîvala Helbestê ya kurdî ya 19'an li Qamişlo (2014).
3- Xelata Seydayê Cegerxwîn (2014 û 2017).
4- Xelata helbestvan Mela Ehmed Palo.
5- Xelata yekemîn ya pêşbirka romana erebî li Cezayir, wekhevî bi romannivîsekî din re.
6- Xelata sêyemîn di pêşbirka kurteçîrokê ya li Behreynê (2008), bi serperiştiya Dr. Xeldîya Al Xelîfe.
7- Bawernameyên rêzgirtinê ji saziyên çand û hunerî yên Almanya û Ewropayê.
Narîn helbestên stranbêjiyê bi şêwazeke kilasîk, ê xurt, bi şêrîniya derbirînê û dilpakiya hestan nivîsandine ku gelek hunermendên kurd li deverên curbicur kirine stran û gotine, wek:
1- Cemal Sedûn – (Soz didim te).
2- Ronî Cezrawî – (Bi xatirê te, Dilê min).
3- Azad Feqe – (Keçikin hatin yadê-Hate canê şêrîn)
4- Ciwan Sebrî – (Ez koçber im-Refrandûm.).
5- Fewzî Elî – (Xew çû, Dêrikê rengîne).
6- Dilo Doxan – (Wê kenî, Dilê dilê, Bûkê).
7- Hêvî Murad – (Xewneroj).
Narîn beşdarî bi dehan festîvalên helbestê li hundir û derveyê Sûriyê bû, ku hebûna wê ya birûmet û beşdariya wê ya bibandor di qada wêjeya kurdî de piştrast kir, mîna:
1- Festiwala helbestê ya Duhokê – 2014.
2- Festivala Cegerxwîn li Herêma Kurdistanê – 2008.
3- Konferansa damezrîner a Yekîtiya Jinên Kurdî li Sûriyê – 2012, ku ew xwedana projeyê bû.
4- Konferansa Revenda Kurdistanî li Sirgûn ê – Berlin, 2024.
5- Beşdariya piraniya çalakiyên Festîvala Helbestê ya Rojavayê Kurdistanê de.
6- Beşdariya bîranîna helbestvan Ferhad Ecmo li Parîsê di sala 2017an de.
Di qada wêjeya Kurdî û Erebî de xwedî cihekî girîng bû, ji ber ku gotar û nivîsên wê di gelek kovar û rojnameyên Kurdî û Erebî de hatin weşandin.
Ji lewra çend kanalên televizyonê jî bi wê re hevpeyivîn û dîyalok pêk anîn, mîna:
(Peyv, Ronahî, Stêrk, Nûçe, Rûdaw, War, Rêbaz, Ark, El-Yûm û kanalên din)
Herwiha nivîskar Narîn Omer hin bernameyên çandî û medyayî pêşkêş kirine ji bo xurtkirina hişmendiya zimanî û wêjeyî , wek:
1- Bernameya "Ziman û Jiyan" li Peyv TV.
2- Bernameya "Navbêjên Kurd" li êzgeya Siba FM.
Nivîskar Narîn di sala 1993'an de zewicî ye û dayîka sê zarokan e.
Di sala 2015'an de ji Rojava derket û berê xwe da Almanyayê û îro li bajarê Karlsruheyê dijî, xebatên xwe yên çandî û mirovahî didomîne û ala peyva kurdî ya li sirgûnê bilind dike.
Ew bi erebî û kurdî dinivîse û berhemên wê yên ku hatine wergerandin bi zimanên Elmanî, Îngilîzî, Spanî,Fransî û Tirkî hene.
Narîn Omer ne tenê nivîskarek an helbestvanek e ku tenê helbestan dinivîse, lê ew bîranînek çandî ye, û dengek e ku hevrêziyê dike di navbera
xewn û êşê , jinbûn û welat, di navbera sirgûn û hesretê de.
Îro di bilindahiya dayîn û afirîneriya xwe de ye, helbest, roman, kurteçîrok û gotarên wêjeyî û civakî dinivîse û piraniya berhemên xwe li ser jin, zaroktî û malbatê radiweste.

# Guhertina pereyên Sûrî

**Çavkaniyên aborî li Sûriyê diyar kirin ku hemû bankên giştî û taybet dê di 27'ê Kanûna 2025'an heta 2'ê Çileya 2026'an ji bo temamkirina proseya pevguherîna pereyên Sûrî werin girtin.**

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Di Tebaxa sala 2025'an de, çavkaniyan eşkere kirin ku hikûmeta Sûriyê ya demikî bi kampaniya çapkirina pereyan ya Rûsî "Goznak" re li hev kiriye da ku pereyên nû hilberîne û di salvegera yekem a rûxandina Esed de wan derxîne.

Çavkaniyên agahdar wê demê diyar kirin ku Sûriye dê banknotên nû derxe û du sifiran ji pereyê xwe derxe da ku qîmeta bi lîreyê vegerîne, ku nirxa wê bi awayekî berbiçav daketibû.

Ev gav qaşo armanc dike ku lîreya Sûriyê xurt bike, piştî kirîza ku 14 salan berdewam kir. Hêjayî gotinê ku lîreya Sûrî ji destpêka krîzê di sala 2011'an de ber bi hilweşînê ve çûye û rêjeya serfê gihiştiye nêzîkî 10,000 lîreyan ji bo her dolarekî, li gorî 50 lîreyan berî şer.

Daketina tûj a nirxa diravî, danûstandinên rojane û veguhestinên darayî dijwartir kiriye.

Malbat, dema kirîna pêdiviyên xwe yên heftane, bi gelemperî kîsikên plastîk ên reş hildigirin ku herî kêm nîv kîlogram banknotên 5000 lîreyî tê de hene, ku niha nirxa herî bilind e.

Li gorî belgeyeke ku Reuters girtiye, Banka Navendî ya Sûriyê di Tebaxê de bankayên taybet agahdar kiriye ku ew dixwaze pereyek nû derxe ku "sifir jê werin rakirin" da ku aramiya darayî baş bike.

### Çapkirina pereyan li Rûsiya

Du banker û çavkaniyek din a Sûrî ku bi mijarê agahdar in ji Reuters re gotin ku Sûriyê bi kampaniya çapkirina pereyan a Rûsya "Goznak" re li hev kiriye ku pereyên nû derxîne.

Wan zêde kir ku rêkeftin di serdana şandeyeke payebilind a Sûrî ji bo Moskowê di dawiya Tîrmehê de pêk hat. Goznak, ku di bin serokatiya Esed de pereyên Sûrî çap dikir, bersiva daxwazên şîroveyê neda.

### Veghuztineke siyasî

Di bin desthilatdariya El-Esed de, bikaranîna diravên biyanî qedexe bû, lê desthilatdariya demikî ya nû ev qeyd rakirin ji bo hêsankirina herkîna pereyan.

Di demekê de ku aborî bi awayekî lez ber bi dolar ve diçe, nirxên rêjeyên sirfa dolar ji pencereyên dikanan bigire heya stasyonan, li her derê ne, li welatekî ku binesaziyeke dravdanên dîjîtal a sînordar heye, fikar hene ku krîzeke lîkvîdîteyê ji bo lîreyê çêbibe.

Di heman demê de ev biryar giraniyek sembolîk jî hildigire, ku dawiya desthilatdariya malbata Esed, ku ji 50 salan zêdetir dom kiriye, nîşan dide. Rûyê Beşar El-Esed li ser banknota binefşî ya 2000 lîreyî xuya dike, lê li ser banknota kesk a 1000 lîre wêneyê bavê wî Hafiz Esed, heye.

Kerem Şear, aborînasekî navdar ê Sûrî û şêwirmendê Neteweyên Yekbûyî, got ku guhertina banknotên ku wêneya El-Esed li ser wan e, guhertinek siyasî ya pêwîst e. Lêbelê, wî hişyarî da ku ji nû ve nirxandina dirav dikare xerîdaran tevlihev bike.

Wekî din Şear ji Reuters re got, Sûriye dikare nirxên bilindtir ên heman diravî, wek banknotên



20,000'an 50,000 lîre derxîne, ku dê armancên wekhev di warê hêsantirkirina destgirtin û hilanîna pereyan de bi dest bixe.

### Tu dîrokeke ji bo derxistina pereyê nû nehatiye diyarkirin

Banka Navendî ya Sûriyê piştrast kir ku hîn tu dîrokeke fermî ji bo destpêkirina derxistina pereyê neteweyî yê nû nehatiye destnîşankirin û îşaret kir ku ew ê hemî hûrguliyan di wextê xwe de ragihîne, piştî ku hemî amadekarî û rêziknameyên pêwîst temam bibin.

Banka Sûriyê di daxuyaniyekê de, di 18' kanûnê de roja Pêncşemê raghand ku ji bilî malpera bankê, xwe nespêrin tu agahiyên din li ser diravê neteweyî yê nû û diyar kir ku hemû danûstandinên bankayî wekî her carê didomin, bêyî ku bandorê li ser xizmetên ku ji welatiyan û veberhêneran re têne peyda kirin, bike.

Bankê piştrast kir ku her ragihandinek têkildarî derxistina diravê nû an amûrên diravî û darayî li Sûriyê tenê ji hêla wê ve bi taybetî û bi fermî bi rêya kanalên wê yên pejirandî were derxistin û tekez kir li dû gotegot an nûçeyên ne rast û pêbawer ve hişyar bin.

# Çandina kartolan li Sûriyê

**Jîn Hisên/Qamişlo**

**Berhema kartolan di nava berhemên çandiniyê yên herî girîng di Sûriyê de ye, çandina wan li piraniya parêzgehan berbelave û ji bo cotkar û bazarên herêmî çavkaniyek girîng a xwarin û aboriyê ye.**

Bi sedan cureyên kartolan hene, ku li seranserî cîhanê bi berfirehî têne çandin. Piraniya cureyên ku li herêmê di çandiniyê de têne bikar anîn cureyên Ewropî ne. Li Sûriyê hejmareke mezin ji van cureyantê çandin.

Armanca hejmareke mezin ji cureyên ku di çandiniyê de têne bikaranîn û cûr bi cûr çavkaniyên wan, ew e ji bo pêşîgirtina li monopola hilberînerek li ser hilberek taybetî ye herwiha ji pirsgirêkên ku dibe ku ji ber xwespartina hejmareke kêm ji cureyan di rewşa kêmbûna tovên wan de li bazaran derkevin holê, dûr bikeve.

### Dîroka çandinê

Kartol li Sûriyê di sê werzên se-



reke de tên çandin:

Çandina biharê: Di navbera nîvê kanûnê û nîvê Sibatê de tê çandin, ku ev dem dema çêtirîn e ji bo çandinê li parêzgehên Laziqiyê, Tertûs, Hums, Hema (herêma Xab), Heleb (herêma Bab, Îzaz û Efrîn), Reqa, Dêra Zor, Heseke (hemû herêm).

Çandiniya havînê: Batata di navbera Adar û Nîsanê de (di rewşên kêm de heta dawiya Gulanê) têne çandin. Ev dema herî baş e ji bo çandina li herêmên sar, an jî yên ku bi kêmanî bi rojek germ û şevek sar têne diyar kirin: wekî herêma Qelemûn (Şam), herêma Qeryateyn (Hums), herêma Selemiyê (Hema) û herêmên çiyayî yên bilind ên wekî herêmên Nebk û Zebadanî (Şam), Cebel El-Hilû û Til Kelex (Hums) û herêma Misiyaf (Hema). Çandiniya havînê li Dûma - Xûta - Dêr Xebiya - Kiswê - El-Tel - Qetena li Parêzgeha Rîfa Şamê belav e.

Çandiniya payîzê: Batata di navbera nîvê Tîrmehê - nîvê Tebaxê de tên çandin, ku ev dem dema herî baş e ji bo çandinê wekî demsala duyemîn li deverên germ ên guncaw ji bo çandina payîzê.

### Amadekirina xakê ji bo çandiniyê

Erd dema ku ax nerm û şil be ango dema ku di kapasîteya zeviyê de nêzîkî %50 şil be tê cotkirin, ji ber ku cotkirina erdê dema ku rêjeyek bilind a şilbûnê tê de hebe, dibe sedema zexmbûna axê, ji ber vê yekê bandorên xirab li ser berhema Betata dike. Erd heta kûrahiya 30-35 cm tê cotkirin, cotkirin du caran di du aliyên perpendîkular de tê kirin, bi baldarî tê dayîn ku bermayiyên nebatan baş bikevin nav axê. Erd du an sê rojan li ber tavê tê hiştin, paşê tê nermkirin û piştî wê li gorî dûrbûna çandiniyê ya xwestî tê nîşankirin.

### Pilankirin û dûrbûna çandiniyê

Dûrahiya di navbera rêzan de û di navbera nebatan de di rêzê de bi van faktoran ve girêdayî ye: Mezinahiya perçeyên tovê, cûreya ku tê bikar anîn, hêza mezinbûna wê ya nebatî, dîroka gihîştina wê, armanca çandiniyê û berdariya axê. Batata di rêzên 60-70 cm fireh û di navbera çala de bi dûrahiya 25-30 cm têne çandin.

Kûrahiya çandinê: Kûrahiya çandina guncaw di navbera 8-10 cm de ye.

### Rêbazên çandiniyê

Kartol li Sûriyê bi çend rêbazan tê çandin di nav de:

Çandina di çalan de: Erd bi xêzan bi dûrahiya 60-70 cm tê nîşankirin, paşê piştî nîşankirinê erd tê avdan û tê hiştin heya ku rûyê wê zuha bibe. Piştî vê yekê, tov di çalan de, li aliyê başûr an rojhilat (aliyê ku ji rojê re vekirî ye) bi dûrahiya 25-30 cm û bi kûrahiya 8-10 cm têne danîn.

Çandina mekanîkî: Ev yek ji baştirîn rêbazan e di nebûna hêza mirovî de, ji ber ku makîneyek çandina kartolan dikare rêzan saz bike, tovan biçîne û wan bigire.



# Êrişên li ser Şêxmeqsûd û Eşrefiyê rûyê hikumeta veguhêz eşkere dike

**Di 22'ê Kanûnê de komên çekdar ên girêdayê hikumeta veguhêz êrişî li ser her du taxên gelê Kurd li Helebê Eşrefiyê û Şêxmeqsûd kirin. Ne cara yekemîn e ku êrişekî hovane bi vî awayî tê kirin, bi hemdemiya dorpêça girankirî ya li ser her du taxan û bi sardana Hakan Fîdan ji Şamê re, ev êriş careke din xwe dubare kirin.**

**Esma Mistefa**

Duh di saetên êvarê de komên çekdar yên hikumeta veguhêz ku li ser bendên ewlekariya derdora taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê bi hêzên Ewlekariya Hundirîn yên taxê re hev beş parastina taxê dikin, lê careke din bi êriş û polîtîkayên qirkirinê êrişên xwe yên hovane nû kirin. vê carê bi amedebûn û seferberiyeke tam ji hemû alî û bajarên hikumeta veguhêz ve hate kirin. Da ku êrişî taxekî ewqas biçûk bikin, gelê xwe li hemû bajaran dikin seferberiyê û bi pilanname êriş dikin.

### Tekiliyên Tirkiyê û hikumeta veguhêz

Ev pevçûn û êriş pilankirî tên kirin ku her care şandeya Tirkiyê ji bo Şamê tê kirin, êriş li ser her du taxan pêk tê. Ev yek jî bi hemwextî serdana şandeya dewleta Tirk a dagirker a bi serkêşiya Hakan Fîdan ji Şamê re pêk hat. Li aliyekî îdiya dikin ku weke ew berpirisyarê aştî, demokrasî û aramiya Sûriyê xwe didin nîşandan ku dibêjin divê HSD'ê peymana 10'ê Adarê pêk bîne û di aliyekî din de jî Şerê Tayebt û fitneyê dide meşandin. Hêjayî bîrxistinê ye ku di 6'ê Cotmehê de gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê li hemberî dorpêçê bi sedan berê xwe dan satirên axî yên ku hikumeta veguhêz a Sûriyê ve hatine danîn û li hemberî girtina rêyan û dorpêçê xwepêşandan li dar xist. Li hemberî çalakiya gel, hêzên hikumetê jî bi gaza îsotê û panzêran êriş kirin, ji ber van êrişan gelek kes birîndar bûn. Di wê demê de jî şandeya Hekan Fîdan hatibû Şamê û pê re tax dorpêç kirin.

Bi van êrişan re ji 25'ê Îlonê ve dorpêçek giran li ser her du taxan hat ferzkirin, bi wê re hikumeta veguhêz nehişt sotemenî û madeyên bingehîn derbasî her du taxan bibin. Ev yek jî zêdetirî heyvekê ye ku jiyana gelê her du taxan di vê sermayê de bixe xeteriyê. Bi tunebûna sotemeniyê re hemû aliyên jiyan bandor bûne weke xebatê şeredarî, dibistan, tenduristî û bi taybet rewşa zarokan.

Li kêlek wê jî hikumeta veguhêz dronên radikirin ser her du taxan, ev jî binpêkirina peymana 1'ê Nîsanê ya di navbera Meclisa Giştî ya Taxên Şêxmeqsûd -Eşrefiyê û nûnerên hikumeta veguhêz de hatiye îmzekirin e.

### Di encama êrişên li ser her du taxan de Şehîdek sivîl û 17 birîndar çêbûn

Li dijî Şêxmeqsûd û Eşrefiyê de jina bi navê Fedwa Mihemed El Kurdî (57) a ji pêkhateya Ereb şehîd bû. Hejmara birîndaran 19 sivîl û 2 ji Hêzên Ewlekariya Hundirîn in, navên birîndaran wiha ne: Henan Ebdulhemîd Îsmaîl (20), Mihemed Ebdulhemîd (19), Ebdulhemîd Îsmaîl (48), Zekeriya Xelîfe (53), Ebdo Eswed (40), Mihemed Nîdal Îbrahîm (18), Aydil Elî (9), Dicle Osman (34), Ebdurehman Horo (18), Doxan Elo (18), Cemîl Ukaş (22), Mehmûd Eswed (20), Mêrvan Bekir (22), Arif Bîlal (20) û Royar Hebeş(13), Zeyneb Henan (25) û Usama Betîx (30), Omer Abdulqadêr (15), Nehle Ebdulrehman Dabul (40).

### Hêzên Ewlekariya Hundirîn ên Helebê

Fermandariya Giştî ya Hêzên Ewlekariya Hundirîn-Helebê têkildarî êrişên li dijî taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê de daxuyaniyek da. Fermandariyê di daxuyaniyê de got: "Wekî bersivek ji bo aramkirina rageşiyê, me talîmat dan hêzên xwe ku bersivê nedin êrişên komên hikumeta Şamê."

### QSD'ê derbarê êrişên li ser Helebê de daxuyaniyek da

QSD'ê îdiayên saziyên ewlehî û leşkerî yên hikumeta veguhêz ku taxên Helebê ji aliyê QSD'ê ve hatin topbarankirin derewandin. QSD'ê diyar kir ku hêzên hikumeta veguhêz li dijî taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê tank û topan bi kar tînin.

Di daxuyaniyê de hat gotin ku "Lêpirsîna rast û berpirsiyarî dikeve ser milê komên parçebûyî yên girêdayî hikumeta Şamê ku ji 4 mehan ve krîzan çêdikin. Ew kom bi rêya dorpêça taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê, dubarebûna tehrîdkirin û êrişên li dijî sivîlan li pêş çavên saziyên



hikumetê, li gel hebûna peymana 1'ê Nîsanê, krîzan çêdikin."

Her wiha di daxuyaniyê de destnîşan kirin ku ev êriş encama çalakiya wan komên bi xwe ye, bi taybet li rojava û bakurê Helebê. Moşek û top ji nuqteyên wan koman ber bi taxên Helebê ve tên avêtin ku tevliheviya ewlehî çêkin û fitneyan derxin.

### Rêveberiya Xweser derbarê van êrişand de bi daxuyaniyekê ev êriş şermezar kirin

Di daxuyaniya Rêveberiya Xweser de hat diyarkirin ku hikûmeta veguhêz a Sûriyeyê berpirsa van êrişan û bandorên wê yên xeternake, ji ber ku ev êriş di demekê de ku pêdivî bi zanîn, xweragirtin û xebateke cidî ya ber bi agirbestê ve heye, bi xwe re krîzên tînin, aramiyê têk dibin.

### Berxwedana gelê Helebê û xwepêşandanên gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo Eşrefiyê û Şêxmeqsûd

Berxwedana gelê Kurd li Helebê ne berxwedaniyeke nû ye, ev gel li hember hemû êriş, polîtîkayên qirkirinê, dorpêç û siyaseta îradeşikandinê yê ku ji aliyê rêjîma Baas, komên çekdar û DAIŞ'ê ve dihatin pêk anîn ji 14 salan ve tê kirin. Bi hatina hikumeta veguhêz re jî careke din ev polîtîka û nêzîkatî bi heman armancê xwe dubare dikin. Li hember êriş, dorpêç û nêzîkatiyên ji salekê ve tên kirin, gelê her du taxan bi îradeyeke pîroz têkoşîn û berxwedanê didin meşandin. Gelê ku li ser bîrdoziya Rêber Apo ya Şerê Gelê Şoreşger mezin bûye û di êrişên ku duh hatine pêkanîn de careke din ev yek di şexsê xwe de mehkum kirin.

Her wiha li kêlek vê yekê Koçberên Efrîn û Şehbayê yên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, şêniyên bajarên Qamişlo, Tirbespiyê, Amûdê, Dêrik, Girkê Legê û Hesekê yên kantona Cizîrê bi çalakiyên protestoyî û daxuyaniyan êrişên komên hikumeta veguhêz a Sûriyeyê yên li dijî taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Helebê şermezar kirin û piştgiriya xwe bi berxwedana gelê her du taxan re li dijî êrişan anî ziman.

### Şerê Tabet yê ku tê meşandin

Hikumeta veguhêz ne xwedî helwest û cesaretê ye ku derkeve û bêje ku em van êriş û kiryaran dikin, nikare li ser ragihandinê derkeve û bêje em peymana 10'ê Adarê pêk nînin. Di êrişên duh de xwe dide nîşandan ku ev êriş ne ji aliyên wan ve hatine kirin, gelo ne ji aliyê wan de bin wê ji aliyê kê ve bin?. Bi vê yekê him lawazbûna xwe dide nîşandan û him jî diyar dike ku hin kom û hêzên din di Sûriyê de hene ku ne girêdayî wan in û ne di bin kontrola wan de ne. Di êrişên duh de hat piştrastkirin ku komên çekdar yên ku bi tangan êrişî her du taxên Helebê dikirin, di hema demê de êrişî hin cihên girêdayî hikuemta veguhêz jî dikirin, ev yek bi armanca sûcdarkirina HSD'ê û rewakirina êrişên xwe yên li ser gelê sivîl tên kirin. HSD'ê li hember vann tewanên derewîn bi daxuyaniyekê derket pêşberî raya giştî.

Hêjayî bibîrxistinê ku heta dema amadekrina vê nûçeyê jî taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ji aliyê hikumeta veguhêz ve di dorpêçê de ne û ketin û derketina ji taxê qedexe ye.

## Lîstika Desthilatdariyê Ya Li Şamê û Berxwedana Gel

**Erdogan Altan**

Mirovekî (Colanî) ku li ber dilê hemû civakan wek e terorîst tê hesibandin, li gorî rêkeftinên navneteweyî û berjewendiyên welatên cûrbecûr desthilatdariya li Şamê bi dest xistin, serdemeke tarî ya nû li ser gelê Sûriyeyê ferz kirin. Bi hilweşandina hikûmeta berê, wan desthilatdariyeke yek-partî ji endamên Heyet Tehrîr el-Şam pêk dihat ava kirin. Armanca veşartî ya vê desthilatdariyê ew bû ku bernameya xwe ya şerîatî ferz bike û Kurd, Elewî, Durzî, Xiristiyan û Sunniyên nerm ji holê rake. Pêvajoya ku di bin navê "diyaloga neteweyî" de dihat meşandin, di rastiyê de ji kiryareke nû ya marjînalîzekirin û zordariyê wêdetir ne tiştek bû. Meclîsa Gel a ku hat damezrandin ji performansek şanoyî ya bi planeke xirab wêdetir ne tiştek bû. Bi piştgiriya dezgehên ewlehiyê, komkujî, revandin û talankirina li dijî kêmneteweyan bû sîstematîk. Civakên Elewî û Durzî hatin hedefgirtin; dêr li Şamê hatin bombebarankirin û kêmnetewe hatin çewisandin. Êrîş li herêmên xweser ên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê zêde bûn û gelê Efrîn careke din ji cih û warên xwe hatin derxistin. Kesên di lîsteya terorîstan de ji bo serokatiya yekîneyên leşkerî hatin tayînkirin û êrîşên DAIŞ'ê zêde bûn. Nakokiyên mezhebî bi rêya manîpulekirina îstîxbarata Tirk hatin gurkirin.

Di aboriyê de, Sûrî bi şîrketên sexte û peymanên xeyalî hatin xapandin. Hêviyên gel bi projeyên sextekar ên ku ji bîst û heşt milyar dolarî derbas dibûn hatin bikaranîn. Torên telekomunîkasyonê ketin bin kontrola dewleta Tirk a dagirker, di heman demê de Îsraîlê deverên stratejîk li başûrê xist bin bandora xwe û berjewendiyên xwe ferz kir. Danûstandinên bi Rûsya û Çînê re ji bo dirêjkirina temenê rejîmê xizmet kirin, ne ku êşa gel sivik bikin. Colanî hewl da ku cihê xwe li cîhana Ereban xweş bike; lêbelê, rabirdûya wî tijî kuştin, bombebaran û revandin e. Bi veşartina endam û reviyayên Birayên Misilman, wî gefên nû li ser welatên herêmî afirandin. Bi piştgiriya Tirkiyeyê, wî destpêşxeriyên aştiyê yên bi QSD re têk bir û hewl da ku daxwazên Kurdan ji bo civakek demokratîk bitepisîne. Her çend banga aştiyê ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji girtîgeha Îmraliyê di nav Kurdan de hêvî çêkir jî, li dewleta Tirk rê li ber vegera Kurdan a ji bo heremên dagirkirî digire.

Li aliyekê din mijareke din a ku divê neyê piştguhkirin ew jî di bin siya vê şer û aloziyê de qêrîna jinan e.


Îro li Sûriyeyê, jin ne tenê qurbaniyên şer lê di heman demê de yên zordariya îdeolojîk jî ne. Desthilata selefî-cîhadî jinan wekî komek civakî ku "divê were sînordarkirin, ger nebe were qetilkirin e" dibîne; ew daxwazên wan ên ji bo azadiyê wekî bêdîn an jirêderketin bi nav dike. Lêbelê, dengê jinan garantiya herî xurt a Sûriyeyek demokratîk û piralî ye.

Piştî salekê, wêne zelal e: Rûxandina Esed û hatina Colanî bo ser desthilatê, ji projeya Rojhilata Navîn a Nû û Îsraîla Mezin bi lez pêş bikeve xizmet kir. Zextên ku ji aliyê DYA'yê ve Dewletên bi rêya Qanûna Sezar tê kirin, desthilatdariya Colanî ku li ber pif û sebrekê ye bêtir qels dike. Hebûna şervanên biyanî, xurtkirina îdeolojiya selefî-cîhadî û nefreta li hember kêmneteweyan ji bo vê rejîmê ne mumkin e ku bi gel re li hev bike. Îro, gelê Sûriyeyê - Kurd, Elewî, Durzî, Xiristiyan û Sunniyên nerm - di daxwaza xwe ya ji bo pergalek demokratîk û piralî li dijî ferzkirinên navendî de yekgirtî ne. Desthilata Colanî bûye gefek rasterast heta ji bo Îsraîlê jî, avahiyek ji Hemasê xeternaktir. Ev rejîm dê zêde dom neke; ji ber ku îradeya gel têra xwe xurte û dê nehêlin êrîşên bi zihniyetên ser mezhebî bi awayek hovane û terorîstî dikin bi ser bikeve.

# 'Hikumeta veguhêz xwe neguherîne, wê ceza dîsa werin ferzkirin'

Endamê NRLS'ê Ehmed Sîno da zanîn ku ger hikumeta veguhêz di terzê xwe de neyê guhertin, wê cezayên Qeyser dîsa werin ferzkirin û got, "Desthilata Sûriyê ya nû wê di bin çavdêriya navdewletî de be, pêwîst e peymana 10'ê Adarê pêk bîne û kiryaran li dijî gelên Sûriyê rawestîne."

**Hemza Sêvo/ Hesekê**



Di 11'ê meha Berfanbarê de cezayên Qeyser ji hêla Meclisa Rûspyên Amerîkî ve li ser Sûriyê hat rahiştin. Ev yek jî li gel berdewamiya kiryarên hikumeta veguhêz li ser gelên Sûriyê, li Siwêdayê, Beravê û herêma Rêveberiya Xweser. Derbarê heman mijarê endamê Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk Ehmed Sîno bersiva pirsên rojnameya me dan û hevpeyvîn wiha bû:

**Hûn rakirina cezayên Qeyser li ser Sûriyê tevî ku hikumeta veguhêz kiriyaran derheqê gelên Sûriyê dike, çawa dinirxînin?**

Berî her tiştî hêja ye ku em Ehmed Elşeri, desthilatdariya nû û HTŞ'ê, hem jî erkdariya wê bidin naskirin. Wekî tê zanîn ev desthilatdariya nû bi serweriya Ehmed Elşeri serokê Desteya Rizgarkirina Şamê ye. Bi destê Birîtaniya, Amerîka û Israîlê ev hikumet hatiye ser desthilatdariya Sûriyê. Erka Colanî ya sereke ew e ku peymana Ibraham bi Israîlê re îmze bike û qonaxeke nû ya aştiyane bi Israîlê re dest pê bike. A din eger Îran û Hizbullah hewil da ku êrişî Israîl bike, hikumeta veguhêz li hemberî wê derkeve. Rakirina cezayên Qeyserê di bingehê de gerek e ji bo parastina gelên Sûriyê ye, lê wê ev zagon demildest encaman bi xwe re neyînê, ji ber ku hikumeta veguhêz gelek şaşîtiyan dike. Ew hîna jî li dijî Elewî û Durziyan, hem jî li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê kiryarên xerab dike û êrişên xwe didomîne. Rabûna van cezayan li ser Sûriyê wê xwedî sûdmendiyeke mezin be li gelên Sûriyê, lê hikumeta Sûriyê xwe neguherîne wê dîsa ceza werin ferzkirin. Ceza bi biryareke navdewletî hate rahiştin, lê ji 3 heya şeş mehan hikumeta veguhêz di bin çavdêriyê de be. Eger hikumeta veguhêz terzê xwe neguherîne ew ê dîse ceza vegerin li ser Sûriyê û sînor di warê siyasî de li hemberî wê werin danîn. Li hêla din wekî tê zanîn peymana 10'ê Adarê di navbera hikumeta veguhêz û QSD'ê de çêbû, heya niha vê hikumetê tiştek li ser rûyê erdê pêkneaniye, ew di bin bandora dewleta Tirk de ye, dewleta Tirk jî naxwaze ewlehî, aramî û pêşketin di Sûriyê de çêbibe. Pêkanîana peymana 10'ê Adarê ji bo tevahiya gelên Sûrî serkeftineke, da ku rewşa vî welatî aram bibe, were avakirin û li pêş bikeve, divê peyman were pêkanîn.

**-Gelo li ser çi pîvan û mercan ev ceza hatine rahiştin û ev yek wê çiqasî ji bo berjewendiyên hikumeta veguhêz be?**

Ji bo rakirina cezayên Qeyser dibe ku hikumeta veguhêz soz daya ji Amerîka û tevahiya civaka navdewletî re. Dibe ku ev soza hatibe dayîn armanc jê ew be ku hikumeta veguhêz desthilatdariya xwe bidomîne. Lê tekez e ku pêkanîna biryara rahiştina cezayan bi peymanan ji hêla Amerîk, Ferens û Birîtaniyayê ve hatiye dayîn. Ev hêzên navdewletî li Sûriyê bi cih dibin, rewşa Sûriyê dişopînin. Rahiştina cezayan di rewşeke nezelal de hatiye pêkanîn, hîna li ser rûyê erdê tu gavên wiha bi cidî nehatine avêtin. Armanc jê ew e ku were zanîn wê rewşa hikumeta veguhêz çawa be, ya rast divê gav bi rengekî zelal wexarin avêtin. Heta niha gav bi zelalî nehatine avêtin, divê ev yek pêkwere da ku baweriya gelên Sûriyê bi hikumeta veguhêz were. Di serî de divê qonaxa veguhêz bi rengekî dadwer were veguheztin, herwiha ev hikumet were cezakirin li ser van komkujiyên ku li Beravê û li Durziyan kirin. Di heman demê de divê kiryarên hikumeta veguhêz derheqê gelan li tevahiya Sûriyê werin rawistandin.

**- Wê rakirina cezayan li ser hikumeta veguhêz çi gavên erênî ji bo gelên Sûriyê bi xwe re bîne?**

Rakirina cezayên Qeyser gaveke baş e ji bo Sûriyê, wê rewşa gelan baştir bibe, lê eger kiryar li Şêxmeqsûd, Eşrefiyê û Dêrhafirê berdewam kirin em ê nikaribin li ser aramî, avakirin û pêşketina Sûriyê bikin. Eger şer, tevlîhevî û kiryar berdewam bikin, wê avasazî çênebe, kargeh û kompanî venebin, zanîngeh, dibistan û peymangeh neyên avakirin herwiha jiyana gelên Sûriyê xweş nebe. Jiyana gelên Sûriyê xweş dibe, dema ku lihevhatineke siyasî, ewlehî û serbazî çêbibe, bi taybet jî divê hikumeta veguhêz vê lihevhatinê bi Rêveberiya Xweser, QSD û MSD, Durzî û Elewiyan re pêkbîne. Di serî de divê kongreyeke niştîmanî were lidarxistin, destûreke nû were derxistin û navê Sûriyê were guhertin bibe Komara Sûriyê. Herwiha entegrasyona QSD'ê çêbibe, Sûriyê bibe yekparçe, mafê gelê Kurd ê siyasî, çandî û hwd… tê de misoger, zelal û parastî be. Li aliyekî din jî sîstemeke nenavendî were avakirin, her herêmek xwedî serxwebûnekê be di hemû waran de û di hin mijaran de girêdayî hikumetê be. Hem jî hikumeteke nû ku nûnertiya hemû gelên Sûriyê bike, bê avakirin. Ya girîng ew e ku dewleta Tirk destwerdana xwe ji Sûriyê rawestîne, hikumeta veguhêz ji bin bandora çete û istixbaratên xwe derxîne, da ku gelên Sûriyê bi aramî bi hev re li bijîn û bi zelalî li hev bikin. Dema ku ev merc û ev xal pêkan bibin em ê bikaribin li ser avakirina Sûriyê, aştî û pêşketina wê biaxivin.

# Ceza bi derengî li çete û xwînmijan hatin birîn

**Reşo Mihemed**



Birîtaniyayê piştî salekê ji rûxandina rêjîma Baas nû cezayên xwe li ser serkirdeyên komên çete yên girêdayî dagirkeriya Tirk, herwiha çend kesên girêdayî rêjîma têkçûyî birîn.

Wezareta Derve ya Brîtanî di 19'ê Berfanbarê de li ser çar serkirdeyên komên çete ku beşdarî kiryarên hovane yên kirîza Sûriyê, herwiha komkujiyên Berava Sûriyê bûbûn, biryara cezakirinê da. Di sizayên Brîtanî de karsazê Sûrî-Rûsî Madloul Elxûrî û Îmad Elxûrî hatiye bibîrxistin û ev kes bi sedema alîkariya rejîma Baas di warê gendeliya aborî de dê bên cezakirin.

Malpera fermî ya hikûmeta Brîtanî daxuyaniyek weşand û ragihand ku ceza li ser du serkirdeyên berê yê rêjîma Baas yê bi navê 'Ghiath Dalla' û fermandarê berê yê rejîmê Muqdad Fataha jî tê pêkanîn. Bi vê yekê û di demeke wiha dereng de biryara Birîtaniyayê dibe cihê pirsê, pirseke wiha ku çima berî niha û di dema pêkanîna komkujiyan de ceza li ser van komên çete û serkirdeyên wan nedihatin birîn. Dema ku komkujî li Efrînê, Girê Spî, Serêkaniyê, Başûrê Sûriyê, Beravê û hwd… an jî dema ku alîgirên rêjîma Baas kiryarên herî xerab derheqê Sûriyê de dikirin, çima demildest ceza ji hêla Birîtaniya û hêzên navdewletî ve nedihatin ferzkirin. Li vê derê cez û biryarên ku tên girtin li gorî berjewendiyên siyasî yên Birîtaniya, Amerîka û hêzên din de tên pêkanîn. Ew ne xemxurên xwîna gelên Sûriyê ne, ew li gorî xwe di dema ku ew bixwazin cezayan li gorî siyaseta xwe dibirin û radikin, ev yek jî dibe binpêkirinek derheqê zagonên mafên mirovan.

Di cezayên Brîtanî de Muhammed Elcasim (Ebû Emşa), fermandarê Lîwaya 25'an ku di artêşa Sûriyê ya niha de cih digire û fermandarê Lîwaya Siltan Silêman Şah, li gel fermandarê Lîwaya 76'an û Lîwaya 'Hemzat', Seyfeddîn Bolad hatine bibîrxistin û ceza li wan hatiye birîn. Wekî tê zanîn ev serkirdeyên çete weke Ebû Emşa û Seyfeddîn Bolad, herwiha komên wan yên çete bi dirêjahiya kirîza Sûriyê ji hêla istixbarata dewleta Tirk a dagirker ve hatin perwerdekirin û rêvebirin. Bûn alav di destê dewleta Tirk û kiryarên herî xirab derheqê gelên Sûriyê de pêkanîn. Piştî rûxandina rêjîma Baas jî cihê xwe di artêşa Sûriyê de girtin, lê dîsa bi fermanên dagirkeriya Tirk tevdigerin û komkujiyan li dijî gelan pêktînin. Demek divê berpirsên van koman weke hikumeta veguhêz û dewleta Tirk jî werin cezakirin. Lê pirs ew e ku gelo Birîtaniyayê dikare sezayên dijwar û tund di warê piratîkî de bi rengekî bilez li ser komên çete û piştgirên wan bide meşandin?

Wezîra Derve ya Brîtanî Îvet Coper got: "Zêdetirî salekê piştî rizgarkirina ji rejîma hovane ya Baas, Birîtaniya berdewam e ji bo piştgiriya gelê Sûriyê û destekê dide hikûmeta veguhêz di warê bidestxistina veguhestineke siyasî ya berfireh. Berpirsyarî û dadmendî ji bo hemû Sûriyeyiyan girîng e ji bo misogerkirina çareseriyeke siyasî ya serkeftî û domdar li Sûriyê."

Komkujî di derheqê gelên Sûriyê bi destê hikumeta Tirk, kesên girêdayî rêjîma Baas, komên çete û dewleta Tirk hatin pêkanîn, istixbarata Birîtanî her tiştî dizane, dizane çiqas kiryarên xerab bi destê van aliyan pêkhatin, dizanin wê çi kiryar bên domandin dema ku ev kes bi azadî tevbigerin. Lewma eger derdê Birîtaniyayê pêkanîna dadweriyê ye li Sûriyê pêwîst e ew hin gavan bavêje. Tevî ceza bi derengî çêbû, lê divê demildest di warê piratîkî de gavan bavêje. Di serî de divê zexteke navdewletî bide avakirin da ku dewleta Tirk were dadgehkirin, ji axa Sûriyê bi temamî were derxistin. Herwiha dozeke fermî derxe ji bo dîlgirtina hemû komên çete, di serî de Ebû Emşa û hemû komên din, hem jî hemû kesên ku cihê xwe di nava artêşa Sûriyê de digirin û komkujî li Beravê û Siwêdayê kirine, werin cezakirin. Li hêla din jî eger Birîtaniyayê daxwaza guhertineke siyasî ya wekehev û avakirina Sûriyeke hevbeş bike, bila li sîstema Rêveberiya Xwser binere, ji ber ev sîstem riya guncav e ji bo çareserkirina pirsgirêka gelên Sûriyê.

## Riwê reş bi derewan spî nabe!



**Dilyar Cizîrî**

Hemxwextî serdana Şandeya Tirkiyê ji Şamê re, çekdarên girêdayî hikûmeta veguhêz a Sûriyê li dijî taxên Şêxmeqsûd, Eşrefiyê û Benî Zêde êriş, pêk anîn. Pêre ragihandina dewleta Tirk, hikûmeta veguhêz û hin welatên ereban şerekî ragihandinê ne normal a xwe dispêre derewan ,dan destpêkirin. Bi yek zimanî îda kirin QSD'ê êriş dike. Digotin êriş bi çekên giran li dijî sivîlan û nexweşxaneyan pêk tên.

Lê balkêş bû ragihandina ji wan re propoganda dikir, gotina pêşiyan a dibêje "Riwê reş bi derewan spî nabe" bi cih anî. Kenala El Hedes a Erebistana Siûdiyê bi dîmenên raste rast nîşan da çawa çekdarên hikûmeta veguhêz bi tangan taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê bi dijwarî topbaran dikin. Di heman demê de nûçegihanê El Cezîrê ya Qeterê di tavlîbûna xwe ya zindî de aşkere kir ku çekdarên hikûmeta veguhêz taxên Eşrefiyê û Şêxmeqsûd bi dijwarî topbaran dikin. Bi van dîmenên rasterast aliyekî rastiyê aşkere dibû.

Li aliyê din mêvanek ji Helebê û xwedî agahî tevlî kenala Sûriya ya ji Tirkiyê fînaseya xwe digre bû û di weşana zindî de got ku avahiya "nûçegihanê kenala Sûriya" bal dikşîne ser û îda dike QSD'ê topbaran kiriye, ji ber topa gaze şewat tê de, çêbûye. Wekî din jî di medya dîjîtal û saziyên din de gelek mijarên rastiya kî êrişî kê dike, diyar dibe.

Lê tişta di vir de aşkere dibe, planek mezin a qirêj li dijî herdû taxên berxwedêr ên Helebê û şêniyên wê tê meşandin. Wer xuyaye ev êriş dê ne ya dawî be. Serkêşiya wê jî istxbarta dewleta Tirk dike. Ji lewam bi hêsanî mirov dikare bêje ne tesadif bû çekdarên girêdayî hikûmeta veguhêz beriya êrişê xwe ji bendên hevbeş ên di encama peymana 1'ê Nîsanê de di navbera wan û hêzên ewlekariya hindir de hatibûn bi cihkirin, xwe vekşînin. Ev bi dîmen ji aliyê hêzên ewlekariya hindir a Şêxmeqsûd ve hate aşkere kirin. Dewleta Tirk û hikûmeta veguhêz ev cara duyemîn e piştî hêzên QSD'ê di encama peymana 1'ê Nîsanê de xwe ji taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê vekişandin, êrişî herdû taxan dike. Ew dizanin QSD'ê xwe ji wir kişandiye û tenê li wir hêzên ewlekariya hindir û gelê sivîl hene. Ji lewama bi van êrişan dixwazin îradeya gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê û hêzên Ewlekariya Hindir bişkînin. Siyasetên xwe yên teslîmkariyê li ser wan feriz bikin. Bi taybet ji ber herdû tax ji hemû aliyan ve di bin dorpêça wan de ye. Wê deverê wekî xala herî lawaz a Rêveberiya Xweser dibînin. Ji lewama bi mehan e hemû riyên ketina wê girtine. Wan wiha fam dikir wê bi hêsanî karibin îradeya gel têk bibin, zextê li QSD'ê û Rêveberiya Xweser bikin, da entegrasyona li gorî ew dixwazin qebûl bikin.

Lê berxwedana duh a hêzên ewlekariya hindir û gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ya li ser esasê şerê gel ê şoreşger hate meşandin, rûreşiya hikûmeta veguhêz û dewleta Tirk aşkere kir. Her çendî di êrişê de birîndar û şehîd çêbûn li Şêxmeqsûd çêbûne, lê bi berxwedanê planên wan ên qirêj û hewldanên wan ên têkbirinê têk çûn, ne tenê ev riwê wan ê reş hîn zêdetir ji raya giştî re aşkere dibe.



# Xebatên Heyva Sor A Kurd yên 2025'an

Heyva Sor A Kurd di sala 2025'an de ji bo destekdayîna mirovî li seranserî Sûriyê kar û xebateke bêhema da meşandin, bi taybet piştî komkujiyên li Berava Sûriyê û Siwêdayê, Heyva Sor A Kurd bi awayekî lezgîn alîkariyên mirovî pêşkêş kir û bi erka xwe ya mirovî rabû.

**Dîlan Muhim\Qamişlo**

Heyva Sor a Kurd di 12'ê Berfanbara 2012'an de li gor zagonên Xaç û Heyva Sor a Navnetewî li bajarê Amûdê ji aliyê 11 bijîşk û hin xwendekaran ve hat damezrandin. Armanca wê ya sereke jî destekdayîn û alîkariya gel di rewşên awarte de ye.

Heyva Sor a Kurd ji dema damezrandinê ve dirûşmeya wê xizmeta civakê û bersivdayîna mudaxeleyên veguhestina birîndar û nexweşan, dabînkirina stargeh, xwarin û lênêrîna tenduristiyê ji bo kesên ku ji ber şer û karesatên xwezayî koçber bûne, ev yek jî bi çavkaniyên sînorkirî hatiye destpêkirin. Dilxwazan ku baweriya xwe bi felsefeya Şoreşa Rojava di berxwedan û jiyanê de anîn xebata xwe ya mirovî li ser prensîbên mafên mirovan ava kirin. Lewma Heyva Sor a Kurd karibû pergaleke sazûmanî li ser bingeha rêziknameyên navxweyî yên rêxistinê ava bike, wê dikarîbû bi hewcedariyên her qonaxê re hevaheng be. Ev yek di çar konferansên berê yên rêxistinê de eşkere bû û tê de stratejî hat pêşxistin, bername hatin dayîn û li gorî vê yekê di rêziknameyên navxweyî de guhertin hatin kirin.

**Kar û xebat wiha ne**

Heyva Sor a Kurd di sala 2025'an de, gelek kar û xebat dane meşandin. Di Sibata 2025'an de, li herêmên berava Sûriyê ji ber komkujî û qirkirina li dijî civaka Elewî hatin kirin, civaka Elewî neçarî koçberiyê bûn. Piştî ku rê li ber derbasbûna Heyva Sor a Kurd ji bo dabînkirina alîkariyê hat vekirin, Heyva Sor a Kurd mudaxele kir û 3 hezar selikên xwarinê radestî gelên li perava Sûriyê kir. Piştî wê jî bi hevkariya Komeleya Mezopotamya duyemîn gerwanê alîkariyên mirovî ku 14 hezar selikên xwarinê pêk dihatin, ji berava Sûriyê re hatin şandin. Di Tîrmehê de, bajarê Siwêda û gundewarên derdora wê ji aliyê hikumeta veguhêz ve rastî êrîşan hat. Di encama van êrîşan de, nexweşxane û çavkaniyên elektrîkê hatin rawestandin û bajar hate dorpêçkirin. Wê demê, Heyva Sor a Kurd ji bo vê yekê bû bersiv û di aliyê tenduristî de destek da gel. Ji bo piştgiriya gelê Siwêdayê, gelên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî dest bi kampaniyayê alîkariya madî kirin. Herwiha Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê milyonek dolar bexş kir û gelek rêxistinên navneteweyî û niştecihên herêmî jî beşdarî kampaniyê bûn.

Heyva Sor A Kurd ji bo bicîhanîna projeya Navenda Emel ji bo nexweşên Penceşêrê, ku armanc dike di çarçoveya projeyê de derman û xizmetên bê dirav ji nexweşên penceşêrê re peyda bike, destek da. Di heman çarçoveyê de nêzî 3 hezar û 500 selikên xwarinê û alîkariyên madî li ser malbatên hejar hatin belavkirin. Herwiha ji bo destekdayîna cotkarên Siwêdayê sotemenî hat belavkirin. Bi hevkariya Komeleya Sened projeyek enerjiya rojê pêk hat, da ku bîrên ku avê didin bajar û gundewarên derdora wê bi hêz bibin. Herwiha du xwarngeh hatin vekirin da ku xwarinê li nexweşxane û gel belav bike.

**Navend, xizmetên pêşkêşkirî û karmendên Heyva Sor a Kurd**

Hejmara giştî ya karmendên li navenda bajarê Qamîşlo bi giştî 186 kes in, ji wan 129 mêr û 75 jin in. Navendên awarte yên girêdayî bajarê Qamişlo, hene. Navendên Heyva Sor a Kurd li Qamişlo, Amûdê, Tirbespiyê, Çilaxa, Girkê Legê, Dêrik,Tel Koçer, Kampa Roj û Newroz, hene.

Li bajarê Qamişlo û Girkê Legê Kilînkên Nexweşiyên Hundirîn, Jinan, Beşa Lezgîn, Dermanxane, Piştgiriya Derûnî û Perwerdehiya Tenduristî hene. Herwiha li bajarê Hesekê Nivîsgeha Lojîstîk, Veguhastin, Darayî, Koordînasyona Bijîşkî, hene. Xizmetên bijîşkî li tevahî navendên lênêrîna tenduristiyê yên destpêkê yên girêdayî kantona Hesekê têne kirin. Li bajarê Heesekê kilînkên Hundirîn, Zarokan, Jinan, Beşê Lezgîn, Teqîgeh, Dermanxane, Piştgirya derûnî û tundiristî heye. Hejimara karmendên navenda Hesekê 461 karmend in, ji wan 285 mêr û 176 jin in.

Xizmeta bijîşkî li kantona Firatê peyda dibe, weke kilînîka nexweşiyên hundirîn, zarokan, jinan, taybet, dermanxane, beşa lezgîn, piştgiriya derûnî û perwerdehiya tenduristiyê. Herwiha ji aliyê Heyva Sor a Kurd ve di 10'ê Îlonê de navenda Tenduristî li bajarê Reqa hat aktîvkirin. Hejmara karmedên navenda kantona Firatê 97 karmendin ji wan 63 mêr in û 34 jin in. Kilînka Tel El-Saman: Ev Kilînîk ji bilî roja Înê her roj di xizmeta gel de ye. Her roj ji saet 8'ê sibê heta sê piştî nîvro xizmetên nexweşiyên hundirîn, jinan û zarokan dike, ji bilî peydakirina dermanan û çalakkirina ambulansê ji bo veguhestina nexweşên ku hewceyê lênihêrîna duyemîn li nexweşxaneyan in. Di heman demê demê de, ji bilî çar Kilînîka mobîl, ev klînîk di dema bersiva awarte de ji bo koçberên Lubnanê û koçberên Şehba di xizmetê de ye. Heyva Sor a Kurd bi rêya van navendên tenduristiyê xizmetê ji bo gel pêşkêş dike, navenda Lênihêrîna Tenduristiyê yadestpêkê û beşa Protezê Taxa Şêx Meqsûdê ne. Hejimara karmendên Heyva Sor a Kurd 19 karmandin û ji wan 11 mêrin – 8 jin in.

Navenda Kampa Ebû Xeşeb li bajarê Dêra Zorê têne peyda kirin. Li bajar klînîkên nexweşiya hundirîn, zarok, jinan û Dermanxane hene. Herwiha 76 karmendênin ji wan 55 jin û 21 jin in. Dêre Zorê beşdarîkirina entegrekirina prensîbên bingehîn li ser asta tesîsên lênerîna tenduristiyê; pêkanîna serdanên meydanî ji bo nirxandina pirsgirêkên ewlehiyê û şêwirmendiya bi civaka herêmî re ji bo destnîşankirina fikarên parastinê û nirxandina bandora dabînkirina lênerîna tenduristiyê. Herwiha ji bo destnîşankirina pirsgirêkên ewlehiyê serdanên meydanî pêk bînin û bi civaka herêmî re şêwir bikin, da ku pirsgirêkên parastinê diyar bikin û bandora dabînkirina lênêrîna tenduristiyê binirxînin.

**Beşdarbûna Heya Sor a Kurd di kampaniyayê gerdûnî de**

Heyva Sor a Kurd beşdarî sala 2025'an de beşdarî gelek kampaniyayê gerdûnî bû, mîna kampanya gerdûnî ya Roja Çalakvanya li dijî Şîdetê, Roja Zaokan a Cîhanî, Parastina mafê jinê, Roja Jinan a Navneteweyî û Meha Hişyariya Penceşêrê, Roja Tenduristiya Derûnî ya Cîhanî, kampaniya pêşgiritina xwekuştinê, Xebat li ser Forma Gilînameyên PSS, Rêxistinkirina şandina ji bo rêxistinên din. Çavdêrîkirina bicîhanîna mekanîzmaya hesabdayînê li hemû navendên bijîşkî ji bo wergirtina giliyan, hatin şopandin, herwiha bersivdayîna ji wan hat dayîn.

**Pirojeyên 2025 wiha ne:**

-Projeyên sereke yên ku piştgiriyê didin çalakiyên Nivîsgeha Parastin û Piştgiriya Psîkososyal.

- pirojeyê jinan jî, ev proje ji bo piştgirîkirina jin û keçên ku di nav civakê de rastî şîdetê hatibûn

-projeya Navenda Parastina Zarokan bi armanca parastin û hêzdarkirina wan, piştgiriyê dide zarokên bê kes. Proje herwiha lênêrîna şopandinê ji bo zarokên bi zehmetiyên fêrbûn an jî axaftinê, çareserkirina bandorên psîkolojîk ên trawmayên berê jî dihewîne. Wekî din, ew rûniştinên parastin û hêzdarkirinê yên ku armanc dikin ji nû ve entegrekirina zarokan di civakê de, digel çalakiyên rekreasyonê yên ku ji bo baştirkirina refaha wan a psîkolojîk û civakî hatine çêkirin.

- Projeya Hêzdarkirin û Piştgiriya Jin û Keçan jî. Ev proje baldarî li ser bihêzkirina kesên bêwar bi rêya peyamên parastin, pêşvebirina xweseriyê û jêhatîyên civakî, çareserkirina hestên neyînî, parastina zarokan û dîsîplîna erêniyê bû. Ev bi rêya çend bernameyan hatin dayîn ev proje wiha bûn girîngiya perwerdeyê, mafê zarokan, keda zarokan, zewace bi temen biçûk in. di îsal de ji aliyê heyva Sor Kurd ve li ser gelek mijaran perwerde hatin dayîn, weke perwedeyên Xewa saxlem, berxwedana civakê, herwiha alîkariya gelek alîkarî jî hatin kirin alîkariya yekem a psîkolojîkî bû.

Di çileya 2025'an de, Serokê Amerîkayê Donald Tramp biryar da ku bername û projeyên ku ji hêla Ajansa Pêşkeftinê ya Amerîkî ve têne fînansekirin werin rawestandin, vê yekê bandoreke mezin li Heyva Sor a Kurd kir. Ji bilî zehmetiyên nedayîna destûra derbasbûna deverên perava Sûriyê û Siwêdayê û belavkirina rasterast a alîkariyan, ku me neçar kir ku em wê bi rêya têkiliyên bi rêxistinan re bişînin. Piştgiriya ji bo beşa Onkolojî, Şewat, Talasemî û Protezê ya Heyva Sor a Kurd, ku xizmetên xwe bêpere pêşkêş dike, hat qutkirin. Lêbelê, ji ber rawestandina piştgiriyê û çavkaniyên sînorkirî, di peydakirina derman û materyalên ji bo çêkirina protezan de zehmetiyan dikişînin.

**Nexweşxaneya Onkolojî, Şewat û Telasmiyayê**

Nexweşxaniya Onkolojî, Şewat û Telasmiyayê girêdayî Heyva Sor a Kurd di dawiya sala 2023'an de hate avakirin. Herwiha bi vekirina vê nexweşxaniyê re barê nexweşê telasmiyayê gelekî sivkbû, ji ber ku berî niha tu nexweşxane û navend tunebûn ku xizmeta van nexweşan bikin. Her tim kesên nexweş berê xwe didan nexweşxaneyên bi dirav, lê ev nexweşxaneya Telasmiyayê bi destkdayîna Hevya Sor a Kurd xizmeta gelek nexweşan dike.

Bi vekirina nexweşxaneyê re şêwirmedî hatin peydakirin, herwiha çend gelek beş temnebû mîna banga xwînê û odeya berhevkirina xwînê berî ku ew di warê dabînkirina amûran û karmendê berpirsiyarê berhevkirina xwînê de temam bibin, nexweş divê ku bexşvan bi xwe re bîne.

Çalakkirina benga xwînê ya nexweşxaneyê û sazkirina wê bi amûrek veqetandina xwînê re, alîkariya zêdekirina kalîteya xizmeta bijîşkî ya ku ji nexweşên talasemiyê re tê berdewam dike, ji ber ku ev nexweş tenê hewceyê veguheztina xirokên sor ên xwînê ne. Herwiha ji bo zarokên bi nexweşiya talasemiyê odeyeke lîstikê hate çêkirin. Di heman demê de, piştgirya psîkolojîk jî dê ji bo zarok û malbatên wan tê kirin. Ji bo ku nexweş xwînê werbigire, odeyek berhevkirina xwînê li nexweşxaneyê hate avakirin. Pêwîstiya nexweşxaneya bi xwînê heye, banga xwînê plazma trombosîtan peyda dike. Komek ciwanên bi nexweşiya talasemiyê niha bi dilxwazî bi karmendên bijîşkî re dixebitin. Projeya tespîtkirina zû ya penceşêra memikê bûye beşek di nav nexweşxaneyê de, ku nexweş her roj di salê de têne pêşwazîkirin û xizmetên wênekêşiyê lê têne kirin. Ev proje demek berê dest pê kirî ye. Bi qasî pênc salan, wî di warê beşdarbûna xwe ya di hişyarkirin û belavkirina hişmendiya jinan de li ser girîngî û pêwîstiya kontrolkirina berdewam ji bo tespîtkirina zû ya penceşêrê de serkeftinek mezin bi dest xist.